Di sedsala 21. de Manifestoya Azadî û Sosyalîzmê

NAVEROK

Têbinîya Weşanxaneyê 79
Destpêk 81

CÎHAN

BUHRANA KAPİTALÎZMÊ VEDİGUHERE
BUHRANA ŞARİSTANİYA SENAYÎYÊ 85

DİSÎPLÎNA KU BÊHNA ŞARİSTANİYÊ DİÇİKÎNE: MODERNİZM 90

ŞARİSTANİYA SENAYÎYÊ XWEZA Û MİROVÎ
BER Bİ TUNEBÛNÊ VE KAŞ DİKE 94

KUREWÎBÛN, EMPERYALÎZM Û GEŞEDANÊN NÛ 96

DÎROKA Jİ NÛ VE Lİ LAYENÊ DİGERE
Û TEKOŞÎNA SOSYALÎZM Û AZADİYÊ 101

PARTÎYA KOMİNÎST YA DİNYAYÊ 106

Dİ GUHERÎN-VEGUHERÎNA GELAN/CİVAKAN DE
FONKSÎYONA PÎŞE Û WÊJEYÊ 111

MEZOPOTAMYA, ŞARİSTANİYA ROJHİLAT-ROJAVA
Û LÊGERÎNA SENTEZEK NÛ 113

HERÊMA ME

Lİ KURDİSTANÊ Û Lİ ROJHİLATA NAVÎN
SÎNOR, Lİ DİJÎ VÎNA GELAN HAT DİYAR KİRİN 117

Lİ SEDSALA 21. QADA ŞERÊ SERDESTÎ YÊ
NAVBERA EMPERYALİSTAN PARZEMÎNA ASYA 118

'SİYASETA BERJEWENDÎ YA NETEWÎ'
TİM DİJMİN HİLDİBERÎNE 120

KURDİSTAN

SİYASETA ENTEGRASYONÊ
YA PERGALA TİRKİYÊ Û ENCAMÊN WÊ 122

Lİ KURDİSTANA BAKUR KAPÎTALÎZM JİYANÊ DİYAR DİKE 123

PİRSGİRÊKA KURD PİRSGİRÊKEK WELAT Û NETEWE YE 126

PİRSGİRÊKA KÊMARAN 128

OL Û KÊMARÊN OLÎ 129

WEKÎ ZAYENDA BİNDEST RİZGARİYA JİNÊ 130

ÇÎNA KARKER, SENDÎQE
Û RÊXİSTİNÊN KEDÊ YÊN NÛ 133

PİRSGİRÊKA WERZEYÊ
Û RÊXİSTİNKİRİNA KEDKARÊN WERZEYÊ 136

YEKÎTİYA AWRÛPA, TİRKİYE Û PİRSGİRÊKA KURDİSTAN 139

KAPÎTALÎZM, ŞOVENÎZM Û CİWANÎ 141

Têbinîya Weşanxaneyê

Danezana di destê we de, di dumahîya sedsala 20an de, piştî ku sosyalîzma reel hilweşîya û her weha tesîrekî neyînî li tevgerên komunîst û sosyalîst kir, hate amadekirin. Girîngîya vê demê jî yek ew e ku, kapîtalîzm li hember ew debdebe û azameta xwe ya `mezin', dîsa jî ji pirsan re çareserî neanî û ber bi xetimandinê ve çû. Ji xwe ev şertê han, mirov dikare li hember kapîtalîzmê wekî lehîyekî nû a şoreşgerîyê jî binirxîne...

Danezan, berhemekî kollektîf e û di atmosfera binketina demî de li hember nexweşîya "îmankirina edebîbûna kapîtalîzmê", ji alî kesên ku bi berxwedanên xwe yên bêhempa ve li ser pîyan mane, bi nêrînekî teorîk/pratîk hatîye amadekirin. Ev berhema, her weha berhema ew kesayetî û sazîyên han in ku dixwazin tekoşîna çînî, carekî din bi awayê xwe yê xwezayî ve ber bi pêşêroja dîrokê bidin meşandin.

Ev belgeyê ku ji alî ew kesayetî û sazîyên ku dixwazin dengê sosyalîst û komunîstên Kurdistanê jî bi taybetmendîyên xwe yên heremî ve di meşa şoreşa sedsala 21emîn de cîhê xwe bigre, hatîye amadekirin; taybetî bi nêrîn û beşdarîyên elaqadaran ve, lê ji dêvla ku raya piranîyê cîh bigre, zêdetir ji nêrînên cûda ku mirov dikare wan nêzî hev bike, hatîye amadekirin.

Belgeyê di destê we de, her weha bi tevkirîyekî çalak ya Hewildana Partîya Sosyalîst a Mezopotamyayê (MESOP) ve, ku dixwaze di Kurdistanê de tevgerekî eşkere û meşrû a sosyalîstan saz bike, hatîye amadekirin. Wekî ji naverokê jî tê famkirin, belge, her weha manîfestoya ew kesên han in ku mîhwerê wan ked e û ji pirsgirêkên tekoşîna netewî û civakî re, ji Kurdistanê, ango ji herêma xwe lê bi çavekî evrensel dinêrin.

Weşanxaneyê me, ev belgeyê di destê we de, ku bi nêrînekî neşmî û gengeşîyekî sê salî ve ji alî sîyasetmedar û rewşenbîrên ku kedekî wanê mezin di tekoşîna azadîya netewî û sosyalîzmê de heye hatîye amadekirin, wekî belgeyekî dîrokî ya komunîst û sosyalîstên Kurda dinirxîne. Ji ber vê yekê ye ku me çapkirina vê belgeyê, wekî wezîfeyekî erênî dît.

Destpêk

Ji bo çi, ji danezana siyasî ya di destê we de ye, pêwistî hat dîtin? Danezan bi xwe bersîva vê pirsê ye. Ku em vebirin;

Ya yekemîn: Dîtin û perspektîfên do yên rast, ne ji ber ku çewt in, lê dibe ku pîr bibin û hatibin borîn. Çimkî fikir, fikrên rast jî distewin, pîr dibin û roj tê tên borîn. Ya ku do rast bû, îro ji nû ve di ber çav re tên derbas kirin, dikare bên derbas kirin. Rastiyên teqez yên nayên guherîn nîn in. Ti waqîe û fikir; nikare berstuya xwe ji jênegera merhela diyalektîk ya ku geşbûn-guherîn-pîrbûniyê têkveduxwe, rizgar bike. Pûxta doktrîna materyalîzma diyalektîkê, Marksîzmê ev e.

Danezana siyasî (manîfestoya kominîst) ku Marks-Engels amade kirine hê jî bi tespît û hedefên xwe yên bingehîn merîyeta xwe diparêze, rê şanî me dide. Heta ku sazûmana kapîtalîst, di çapa dinyayê de heta hetayî neyê borîn, ev tespît û hedefên bingehîn, dê merîyeta xwe biparêzin. Lê belê geşedanên nû jî hene.

Ya duwemîn: Marks-Engels di manîfestoyê de, binê hebûna tixûbên kapîtalîzmê xêz dikin ku ew jî mîna her weqîeyeke dîrokî weqîeyek e. Bi taybetî Marks wekî din (di berhema xwe ya bi navê Grûndrîse de) têkildarî ku kapîtalîzm dê çawa bigihîje tixûbên geşbûnê pêşdîtin û tespîtên girîng dike. Lê belê kapîtalîzm di heyama Marks-Engels de, heta di ya Lenîn de negihîştibû tixûbên geşbûnê yên xwezayî. Geşedanên têr û tijî yên sedsala vê paşiyê kapîtalîzm bi qanda dîrokî, ji alî geşbûna fizîkî (xwezayî) ve jî bere bere digihîje sînorên xwe. Ev rewş, geşbûneke ku dê li çapa dinyayê, tesîrê li helwest û berîdayîna tevgera kominîst bike.

Ya sêyemîn: Destêwerdana mirovî ya xwezayê jî û reaksiyona xwezayê jî ne nû ye, rehên wê digihîjin berê. Lê belê di dewra Marks-Engels, heta ya Lenîn de mirovahî, bi çavdêrîya parastina hevsenga xweza û dorhêlê

ku vatinî û berpirsiyariyek şênber e, rûbirû mabû. Hê di serî de di tevna şaristaniya kapîtalîst û wekî dînamîka çînî ya wê, di mêtingerîya burjûvazî ya bêsînor û xirsa karê wê de dorhêl, xweza û mirov talankirin hebû. Lê belê şaristaniya senayî ya kapîtalîst ku tevî xwe, mirovahî û xweza ber bi tunebûnê ve birin, di van salên paşiyê de rû da û bû pirsgirêkeke rojane. Reaksiyona refleksa parastinê ya xwezayê ku li dijî vê êrîşê pêk tê û wekî parçeyek lebatî ya xwezayê parastina dorhêlê û xwezayê ya mirovî, di çaryeka paşîn ya sedsala 20. de aj daye û di serê sedsala 21. de bûye qada şer ya li dijî kapîtalîzmê.

Ya çaremîn: Di manîfestoya kominîst de "li gel pêşdeçûna navgînên hilberînê, burjûvazî, hemû miletan heta bi yên herî barbar jî dikşîne nav şaristaniyê" dihat gotin. İro û heta ji zû ve, Çîn, Hindistan, İran, Tirkiye, Misir ango Başûr jî vekişiyan nav şaristaniya senayîyê. Pirsgirêk êdî Başûr û Bakur pev re, dê çawa nihaiyen şaristaniya saneyiyê biborin e. Êdî pirsgirêk ji zû ve, ne ku Başûr, Rojhilat jî ji barbariyê rizgar bike û "vekişîne şaristaniyê" ye; wekî gihîştina sentezek nû borîna şaristaniya senayî ya Rojhilat û Rojava xwe dide pêş. Di serî de di vê derbarê de tevgera kominîst ya dinyayê û em bi şirovekirinek nû re rûbirû ne.

Dewra Marks-Engels dewra geşbûn û pêşdeçûn û şaristanîkirin ango şoreşger, wekî xwedî potansiyelek pêşdebirinî ya burjûvazî ye. Tevî Şoreşa Îlonê çaxa şoreşên proleter vebû û Lenîn bi pratîka Şoreşa Îlonê re wekî gişti hindabûna barûda burjuvazî ya şoreşger îlankir. Di serê sedsala 21. de, em di momentek wisa de ne ku şaristaniya senayî ya kapîtalîst li gel xwe, xweza û mirovahiyê bi tunekirinê dehdît dike. Marks-Lenîn, çaxên xwe bi nêzîktêdayîn û metodan fêm kirin û bişkaftin, tevgera kominîst ya roja me jî divê bi heman nêzîktêdayîn û metodan tevbigerin.

Ya pêncemîn: Modernîzm, herçend di dewra Marks, heta qismen di ya Lenîn de, ji bo şaristaniya senayî ya kapîtalîzmê felsefe –tevne – buyerek ku dînamîzm tevlê kiribe, pêş de biribe jî; di dewra me de li gel buhrana kûr dibe, vediguhere ya ku disîplînek ku bêhna şaristaniya senayiyê diçikîne, modernîzm êdî di heman demê de nikare barê enternasyonalîst, lîberal, kominîst, mihafezekar, fiturîst, nihîlîzmê, romantîzmê, klasîzmê û şoreşgeriyê hilgire. Bi kurtasî, ligel tevn-felsefe û buyêra modernîzm, ji her hêlê ve barê dijîtiyê yê mirovahiyê nikare hilgire. Ji ber ku nikare hilgire jî, wekî hilberînek buhrana heyî, postmodernîzmê hildiberîne. Ji vê hêlê

ve jî, ji danezanek nû re diviyahî heye. Ligel sosyalîzma sedsala 21. civaka çand serdest ya kominîst ku danezaneke tarîfa wê bike were hilberîn, di nav vatiniyên tevgera kminîst ya cîhanê de ye.

Ya şeşemîn: Di sedsala 21. de bi navenda partî ya erdnîgariyekê de enternasyonala kominîst nikare were ava kirin. Êdî bi navenda her partî an erdnîgariyê teşegirtî û li şûna tenê enternasyonalek ku ji partiyên seksiyonên wê pêk tê, tevgera kominîst ya her partî û erdnîgarî ya ku herkê dide navendê û wekî parçeyek ji orxanên navend tevbigerin, partiyek kominîst ya dinyayê divê armanc bê girtin. Ev armanc danezanek nu divê.

Bi nîsbeta ku tevgera kominîst ya dinyayê, karibe di vî warî de bi ser bikeve, bi nîhayî dê karibe navendîtiya Ewrûpa hilweşîne û beyî ku navendîtiya Rojhilat biafirîne, Şoreşa Îlonê ji nû ve hilberîne û senteza Rojhilat-Rojava dê karibe ava bike.

Ya heftemîn: Ji boTevgera Kominîst ya Kurdistan, li gel van arîşeyên gişti, ji danezanek ku pirsgirêk û berîdanên xweser têkvexwe û ku wekî diviyahiyekê xwe dide pêş, pêwist dıbine.

Hilweşîna sîstema sosyalîst ya di paşiya sedsala 20. de, ligel tevgera kominîst ya dinyayê û tevgera kedê ya navnetewî, li ser tevgera kominîst ya Kurdistaê jî akamek cidî kiriye.

Wekî girêdana van geşedanên gişti, tevgera kominîst li pey hev sê şikestinên cidî jîya.

a) Di bin êrîşên giran yên derbeya faşîst ya 12 ê İlonê de, tûşî şikestinek fizîkî bû. Di serî de kadroyên rêveber, avahiya bi rêxistin bi tevahiyek mezin derket derveyî welêt. Li welêt piraniya partî û rêxistinan ji hêla rêxistinî ve tesfiye bûn.

b) Ligel ruxîna sîstema sosyalîst, di qada îdeolojîk-teorîk de şikestinek pêk hat. Çi bigre hemû partî û rêxistin, di demek kurt de, ji parastina Marksîzm-Lenînîzmê û ji armanca sosyalîzmê qetîyan. Wekî din, bi tesîra kampanyaya lîberalîzmê ya "ji îdelojiyê re na" re, bê îdeolojî bûn, tûşî ruxînek kûrî zihnî jiyan, legel vê ji jiyanê qetiyan, ketin nava tebat û bêlebatê.

c) Ligel dagirkirina DYA ya İraqê û avabûna Dewleta Kurd ya Federe, şikestinek din jî hat jiyîn. Tevgera demokratîk ya netewî ya bakurî, derî helwesta dijî rejima ûnîter ya Tirkiyê, hemû refleksên "dijî" tiyê wenda kir. Tevgera neteweperwer, ji armanca dijî emperyalîst heta dijî feodaliyê jî

qetiya, ji hêla siyasî ve bêwekat bû.

Di mercên ku demara netewî ya demokratîk ji 40 salan vir ve li ser siyasetê dike û tê de westiya û hincirî de, kominîstan, di gava pêşîn de ne partî, lê vatiniya afirandina tevgerek nû daxuyandin û ancax li ser tevgerek nû dê karibe partiyek nû were avakirin, bi van tespîtan ji raya giştî re îlan kirin.

* Li ser vê erdnîgariyê, ji bo ku ji nû ve belav bibe, birize, hevdanekê armanc nake. Di gelê kedkar-xebatkar û qadroyan de; di jiyana siyasî, civakî, çandî de, kêm-zêde ku hemberîya wê nîn be, ango qezenca wê nîn be ku bibe sedema westiyayiyên nû, valabûna enerjiyê, naxwaze hewla meşekê bide.

* Naxwaze ku enerjiyê ragihîne partî / tevgerek ku dê bi yekîtiyek organîk encam nede.

* Armanc nake ku, partî / tevgerek ku îdîa û armanca wê ya karibe karker, kedkar, ciwan û jîyîna siyasî, civakî, çandî ya gelan ku bi armanca şoreşgeriyê ve girêdayî biguherîne û naxwaze tenê partiyek ku bifikire, lêbigere, raberize ava bike.

* Nafikire ku di nexşeya zihnî ya xwe de cîh bide rêxistinekê, partiyekê ku dê bêlebat bimîne, bixitime, bîroqrat bibe û xwe bicarîne.

Wekî din, ji ber van dîtin û berîdaniyên xwerû yên Kurdistanê jî, ji danezana siyasî re diviyahî hat dîtin.

Di demek weke sê salên dirêj de, di hilberîna ramanî de, li ser dewlemendiya “ez” a me, em gihîştin asta ku karibin li ser “em” ê biteşînin. Danezana siyasî hilberînek vê astê ye.

Êdî, kirpa “her gava pêş de avêtî, her pêşdeçûnek reel, ji duzîneyek bernameyan girîngtir e” di tekoşîna tevgerek siyasîbûn de, dê bibe rêberê me.

Kominîstên Kurdistana Bakurî, wekî çepê siyasetê, bi îdîaya ji nû ve honandina dînamîka kominîst, bi rê ketin. Di xwerû ya me de, honandina yekîtiya kominîstan û dînamîka kominîst ketiye nav hev û pirsgirêk ji tekoşîna hilberîna qada îdeolojîk - felsefîk wêdetir, bi bawerîya ku dê di qada şerê pratîk-polîtîk de bibişkêve, bi layena vê armancê ketin şer.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan di serê sedsala 20. de, Lenîn çawa nêzîkahî li Marksîzmê kiribû, îro bawer dike ku wisa nêzîkahiya Lenînîzmê bête kirin û di vî aliyî de, tevgera kominîst ya cîhanê gazî vatiniyê dike.

CÎHAN

BUHRANA KAPİTALÎZMÊ VEDİGUHERE BUHRANA ŞARİSTANİYA SENAYÎYÊ

Kapîtalîzm bere bere êdî wekî dîrokî meşrûiyeta xwe wenda dike. Êdî ne tenê li nik karker û yên tên mêjtin, hatiye rewşa ku di zanîn û wîjdana mirovahiyê de jî tê darizandin. Kapîtalîzma ku pêşî li bakurî qam da, hem wekî ufkî û hem wekî emûdî gihaşt geşedana sînorên xwe yên xwezayî û bişid dest bi wendakirina rewşa xwe ya hilberkar kir. Di serî de Çîn û Hind, li Başûrî, sermiyana emperyalîst kapîtalîst ku berî da hilberîna yekser, li gel hin faktorên din, hilberîna vê geşedanê ye. Başûrî, weke qada erdnîgariyek geşedanê ya nû, ku di serê salên du hezaran de ku bi kûrahî ji çanda hilberîna kapîtalîzmê re vebû; kapîtalîzm gihaşt sînorê geşedana fizîkî. Sînorekî dinyayê û kaniyên wê heye. Çîn û Hindistan di serî de, Asya, Afrîqa û Amerîkaya Latîn, di asta civakên Rojhilat de her ku ji çanda xerîdarî re vedibe, kaniyên dinyayê vî barî ranagirirn; sinyalên cidî yê ewilî ya ku dê nikaribe ragire, ji demekê ve belav dike.

Buhrana avahî ya ku kapîtalîzm di salên du hezaran de jiya, ji ya ku di

rabirdû de demdemî jiyaye, hem ji hêla çiqasî hem jî ji hêla celebî ve ciyawaz, kûr, domdar û kûrewî ye.

Kapîtalîzm, milkiyet pîrozwer kir û derxist qata Xweda; lê belê heman kapîtalîzmê, piraniya civakê ji milkiyetê qetand û bêmilk hişt. Nakokiya di nava wesfa hilberîna civakî û milkiyeta li ser navgînên hilberînê de, ango kûrbûna nakokiya di navbera hêzên hilberînê û têkiliyên hilberînê de ku kûr dibe, ji vir tê.

Kapîtalîzm, xebata aborî ji navgîntiyê derxist kir armanc û pîrozwer kir. Ewqas ku, aqil gihand aqlê aboriyê, aqlê aboriyê jî gihand deraqil û bigiştî mirov, bı taybetî hêza kedê ya bimûçe, kir koleyê xebatê. Di bingeha van giştan de, berjewendiyên çînî yên burjuvazî hene. Lê belê heman kapîtalîzm, di pêvajoya hilberînê de her ku têketiyên teknolojîk berfireh cîh digrin, bi vê rêjeyê, bere bere, hêza kedê ji xebatê qetand û diqetîne. Betaliya ku di salên du hezaran de bi lez zêde dibe, nakokiya civakî ya kapîtalîzmê kûr dike. Bêkarî duh, ji bo burjûvazî, navgîna çewsandina hêza kedê ya dixebitî bû. İro, artêşa bêkaran ya ku hêjmara wan digihîje 1 milyarî, bûye hêzek ku gef li kapîtalîzmê dixwe.

Kapîtalîzm, di asta ku ti civak negihîştibûyê, teknolojî geş kir; ji senayiyê heta bazirganiyê, ji zîreetê heta sektora xizmetê, ji perwerdê heta veguhastin û ragihandinê, di her qadê de geş kir û dike. Lê belê heman kapîtalîzm, teknolojî, bigiştî ne ji bo mirovahiyê, ji bo xizmeta çengek çîna serdest bikar anî, bikartîne. Teknolojî, bi rêjeya ku ji burjuvazî re rîya kar, xwînmêjî vekirinê, gihand gel, karker û kedkaran. Di hemû sektorên aboriyê de; paralelî têketînên teknolojîk, di hevgirtina giştê sermiyanê de, rêjeya sermiyanê sabît (neguherî) mezin bû, rêjeya sermiyanê guhertî (keda jîndar) jî biçûk bû, biçûk dibe. Ev geşedan li gel ku derfeta, li şûna 12–10–8 demjimêr roja xebatê ya bimûçe, girêdayî mercên xwerû 8 – 6 heta 4 demjimêr, pêşkêş bike jî; sermiyanî dijî vê yekê, hêjmara kesên xebatkar kêm kir û hêza keda xebatê bera nava kuçeyan (artêşa betalan) dide. Burjuvaziyê ku di vê yekê de israr dike, di civaka kapîtalîst de; taybetî di hilberînê de, geşedana otomasyonê (ango li şûna keda jîndar, bikaranîna wekî makîneyên robot bikaranîn) asteng dike. Bikurtasî, diviyabû ku wekî navgîna hilberînê makîne (teknolojî) di xizmeta karker û mirovahiyê de be, di xizmeta sermiyan de, adetî karker radixe erdê. Ev geşedan, di kapîtalîzmê de, geşbûna hêzên hilberînê asteng dike, li gel vê li civakên

Rojava sermiyan, ku meşrûiyeta xwe winda dike, hilberînê vediguhêze Başûrî ku lê ked pir û erzan e. Ev berîdanî; li gel ku li Başûrî mercên çînan û yên tekoşîna nav wan bihêz dike; (ji ber ku giraniya merkeza aborî û hilberînê ji nû ve vediguhêze Başûrî) li Bakur jî dibe sedema betalî û rawestina aborî.

Hin îdeologên burjûvazî dibêjin "zanistî", di "dema zanînê" de, bi "saya teknolojiyê, di hilberînê de pêwistiya hêza kedê buhurî, ji holê rabû". Di roja me de ku li erdnîgarîya ji Çînê ta Misrê zêdetirî 1, 5 milyar karker ji xwînmêjiya sermiyana navnetewî re vebûye, ev îdea tenê pêkenok e. Nakokiya navbera ked û sermayê hem di asta cîhanê de kûr dibe, hem jî bi rêjeyek zêdebûyî, bi nakokiya mezinbûyî ya navbera mirov û kapîtalîzm, xweza û kapîtalîzmê re hevûdin dinixumînin. Nakokiya sîstema kapîtalîst ku bi mirov, bi mirovahiyê re pêk tê, ji nakokiya ked sermiyanê xwedî dibe û geş dibe, gihîştiye astek wiha ku tekoşîna antî-kapîtalîst, xwerû hêza kedê ya bimûçe û bi giştî jî derveyî çengek serdestan, bûye pirsgirêka hemû mirovahiyê.

Kapîtalîzm; derûnî, bedenî, zîhnî hemû daxwaz, têhildan, pêwistî û civakîbûna mirov, xist binê dagirkirina xirsa karê, têkiliyên piyasê û deshilatdariyê. Ewqas ku her tiştê aîdî mirov tê metakirin, her tiştê civakî, tê bazirganîkirin, hemû mirovahî û xweza dibe notera piyasê. Kapîtalîzm mirov kiriye heyoka hilberîn, xerîdarî, karê, xwînmêjî û cîhana wî ya derûnî tunekir, ji derûnî û zihnî ve ew seqet kir. Zêdetir, wergerka hilberîn-xerîdarîyê ango derî ku mirovî weke heyoka xerîdariyê dibîne, êdî bi qanda ku mirov nehêjayî karkerkirin û mêjtinê be, wî bêrûmet dike, adetî wî dike kêzik.

Helbet robot hildiberînin, bi ser de jî sendîqeyê naxwazin, girev nakin; bê belê yê hilberî jî naxeridînin.

Li gel ku robot ketin dewrê, qêrîna kefê ya burjuvazî ku digot "em ji çîprûtan rizgar dibin, robot ne serî hildide, ne sendîqê û ne jî grevê dixwaze; wekî din bi qanda dixwazim, ez karim hilberînim" kurt dom kir, ji ber ku robotê hildiberî ne xerîdar bû. Ji ber vê yekê sermiyê; an dê karker û gel hîç nede xebitandin an jî dê demjimêra xebatê daxîne, lê ji bo xerîdarîya yên hilberî de, hêza kirînê (dirav) bide, ku ev jî dûrî xwezaya kapîtalîzmê ya li ser bingeha kar û mêjtinê ava ye; an jî mîna ku niha pêk tîne, di pêvajoya otomasyonê de, dê bêtir berî bide hilberînê û cîh bi cîh

artêşa betalan ku mezin dibe, bi arîkariyên civakî girê bide jî, girseya wê ya mezin terkî birçîbûn û sefaletê bike, bi rêjeyek mezin bi buhrana hilberîna zêde re dê rû bi rû bimîne. Ji ber vegerka hilberîn û xerîdarî bitûnek e. Hilberîn nebe xerîdarî, xerîdarî nebe jî hilberîn nabe; ku bibe jî tu nirxeke wê nîne. Di bingeha krîza hevdanê (hilberîna zibare) ya kapîtalîzmê de an daxwaza têrbûna piyasê ya ji hilberan an jî, li dijî birçîbûnê daxwazê ji ber ku hêza kirînê, ne ku ev jî daxwazê kêm dike heye. Di serê salên du hezaran de, di serî de civakên Bakur, li dinyayê herdu regez jî krîza kapîtalîzmê kûr dikin.

Kapîtalîzm; li gel dewletnetewe hevûdin xwedî kirin û welidî, bi vegotinek din netewedewlet di şeveqa kapîtalîzmê de welidî, geş bû û parêzvaniya sermiyê hilda ser milên xwe. Li pişt dîwarên gumrikê yên netewedewletê sermiyana netewî mezin bû, bihêz bû. Ewqas ku, netewedewlet bu buyêrek ku ji alî sermayê ve hat pîrozandin. Lê belê di pêvajoya niha de, di serî de li Ewrûpa, sermaye û netewedewlet hat rêveqetandinê û tê. Hêza aborî-siyasî ya ya ku netewedewlet niha xwedî ye, biçûk nayê dîtin. Lê belê bi rêjeyek mezin her netewedewlet, di serî de bi serdestiya aborîya navnetewî, di bin giraniya têketina siyasî, çandî de, di bunya wê de, qada navnetewî, mezin dibe. Ev geşedan; netewedewletê bere bere di navbera aborîya netewî û ya navnetewî de di hecinîne û ji vê yekê wêdetir, wê veduguherîne yekîneyek ku pêwistiyên aborîya navnetewî ya emperyalîst-kapîtalîst. Sermaye, di erdnîgariyek ku lê dewlemendî navendî dibe û lê bi pîvek netewî hilberîn birêxistin dibe û wekî disîplînekê, mîsala ku buhurandina netewedewletê derdek, wekî nebuhurandinê jî di "axurê netewî" de talîm kirin du derd, ber bi venebûnekê ve tê vekêşan. Di serî de li Yekîtiya Ewrûpayê semaye, berîdana ligel bazara netewî, netewedewlet û artêş, al, pere ku sembolên netewî ne, di serî de pirsa, wekî hêza parastinê dê çi şûna artêşa netewî bigre, sermaye raberî nakokî û xetere û gelek pirsgirêkan re rûbirû dihêle.

Rêzika giştî ye, piyasa serbest ango "destê piyasê yên nepenî, bêyî ku kulmikeke nepenî hebe, ti caran bikêr nayê" Çimkî piyase, li derên ku lê mafên milkiyetê di bin ewlekariyê de û çarçeweya siyasî, artêşa kulmika nepenî ya ku ji alî makezgonê ve tê parastin, kare bixebite. Di van salên paşiyê de gava ku sermaye berî dide dewletnetewê bibuhirîne, pirsgirêka herî mezin ya ku lê rû bi rû dimîne, wekî avahiya milîtarîst (kulmika nepe-

nî) bi dewletê ve girêdaniya jiyanî ya wê ye. Ewqas ku sermaye, di dubendiya buhurandin û nebuhurandina dewletneteweyê de, bi qanda dîrokî be, ji hêla fizîkî ve jî ber bi sînorên xwe ve pêş ve dere. Marks; "Sermayeya ku giştîbûna ku bêrawest berpê diçe, di nav avahiya xwe de raberî ling girêdanan dimîne; di pêvajoyek geşedanê de evana, ling girêdana herî mezin ya li pêşberî vê dînamîkê bixwe, dê bide fêm kirin û ji ber vê jî dê sermaye xwe bi xwe rakirinê pêwist bike" (Grûndrîse. Rûpel 449. Weşanên Bîrîkîm) Ya girîngtirîn, ligel sînorên netewî, buhurandina siyaseta girêdayî xaka netewî, ji bo kominîzmê tirsa dê kîşwera siyasî, civakî, çandî bistewîne, bariyerek din e ya ku sermaye, dewletneteweyê bibuhurîne.

Sermaye, wekî bûyêrekê pirsgirêka ku dipîrozîne malbat jî venebûnek hevşib dijî. Êdî li Bakurî (Awrûpa û Amerîka Bakur) bere bere derbasbûna civaka piştî malbata dendikî tê jîyîn; di rewşek ji par re, li Başûrî jî pêvajoya belavbûna malbata dendikî tê jîyîn. Ji aliyekî ve ev geşedanên ku buhrana civaka kapîtalîst vedide, di pêvajoyek fireh de malbata dendikî û bigiştî di derbasbûna civaka piştî dewletê hinek daneyan pêşkeşî tevgera kominîst dike.

Tevgera kominîst li serê sedsala 21. de, mîna tevgera kominîst ya sedsala 20. li şûna dewletnetewe û malbata dendikî, dewleta sosyalîst û malbata sosyalîst tenê nikare bixwe bernameya xwe, ku bixwe pirsgirêkên giran yên niha raberîye, nikare bibuhurine. Tevgera kominîst ya roja me, wekî ciyawaz ji tevgera kominîst ya sedsala 20. derbasbûna ji dewletê berbi bêdewletiyê, ji malbata dendikî berbi piştî civaka malbata sosyalîst, divê bike armanc. Li vir, tenê ne perpektîfek dîrokî, pêwiste xwediyê perspektîfek (bernameyek) ku gav bi gav armanca ku tê rojanekirin be. Ev pêwistî ne tenê li Bakurî, çend gav ji par re be jî; li Çîn-Hindistan, Tirkiye, Misir di serî de, li Başûrî jî xwe dide der. Erdnîgariyek hindik ku hêna pirsgirêka netewî nehatiye pişkaftin, li der bête hiştin; di serî de Awrûpa, DYA, Rûsya, Çîn hwd. partiyên kominîst yên van welatan ku di programên xwe de armancek ku bêjin "ez werim îqtîdarê, ezê malbata sosyalîst bihêz bikim, diyar bikin, dê li paş trenda dîrokî bimînin.

Tevgera kominîst ya dinyayê, di serî de milkiyeta takekesî û aborîya xebatê ku kapîtalîzm wan nirxan dipîrozîne, divê bi programek alternatîf red bike. Riya azadbûna mirov, di buhurandina milkiyeta takekesî û disîplîna kapîtalîst ya xebata aborî armanc dike re, derbas dibe. Di pêvajoya hilbe-

rînê de, li şûna keda jîndar, paralelî cîh girtina wekî keda objektîf makîne, divê mirov ji kolebûna xebatê rizgar bike û wekî armancek rojanebûyî daxistina demjimêrên xebatê bête plankirin. Bi îfadeyek din, hilberîna bimakînebûn ya keda objektîf an jî keda hevdayî, navgîna "fireh kirina dewlemendkirin, geş kirina hebûna kedkaran" bête program kirin. Mirov ancax di vê hoyê de, ji biyanî bûna xwe, ji hilberîna xwe dê rizgar bibe, dê parçebûna navxweyî bibuhurîne, derûniya dinyaya xwe dê dewlemend bike û dê bibe mirovê bitûnî û azad.

DİSÎPLÎNA KU BÊHNA ŞARİSTANİYÊ DİÇİKÎNE: MODERNİZM

Qadên ku buhrana şaristaniya senayiyê ya tîpîk lê vediguhere, qada buyêr-tevn-felsefeya modernîst e. Tevgera kominîst ya roja me ciyawazî tevgera kominîst ya sedsala 20. bi pêwistiya buhurandina modernîzm û avahiyên modernîst û qada disîplînê ve rû bi rû ye.

Marks, Engels ji çaxa burjûvazî re ku digotin "çaxa me" aborîya feodal, pederşahî û girtî û kevneşopiyên wê ruxand "navgînên hilberînê û li gel wan hemû têkiliyên civakî bêyî bike şoreşger, nikare hebe" (Manîfestoya Kominîst) bi vê gotinê rola burjuvazî ya şoreşger kirpandin; di heman pêvajoyê de ronîbûna sedsala 18. û dînamîka çînî ya şaristaniya senayiyê ji berjewendiya çînî ya burjûvazî pêk tê berbiçav kirin û rexne lê girtin. Ligel rexneyên ku qetandina ji felsefeya ronîbûnê dinimîne, jê xwedî jî dibe. Dikare bête gotin; Marksîzm li ronîbûna sedsala 18. û bi taybetî li damara çep hem tesîr kir û hem jî jê tesîr girt. Wekî din binê dîtina, di civaka burjûvazî ya spartî milkiyeta kesî de, rabirdû li îro serdest e û bi nêrîn rabirdû ye; di civaka kominîst de jî dijê vê îro serdestî rabirdû ye û xwedî dahtûyê ye, xêz kirin.

Di nêrînên Lenîn de, di çaxa şoreşên proleter yên ku di sedsala 20. de bi Şoreşa Îlonê re vebû, kirpa, di serî de Kûreya Rojava xeridîna barûda şoreşger ya burjuvazî; bi awayekî berbiçav hem tekoşînên serxwebûnê yên netewî hatine buhurîn û hem jî ligel ku kapîtalîzm bi kûrahî di çapa dinyayê de geşbûye; cih bi cîh rola şoreşger ya burjuvazî ku di sedsala 20. de dom kir, tê dîtin ku di roja me de li Başûrî jî qediyaye.

Kominîst, divê li ya modern ango ya li gorî demê, ya bi têkvexwarinek modern ango ji gavên şaristanîbûna mirovahiyê heta roja me her gavek, hewlek pêş de hatiye avêtin, pêwiste wekî ku dewlemendiyê ku herikîbin

hewza çandê ya mirovahiyê bête dîtin û xwedî lê were derketin. Lê belê ronîbûna sedsala 18., senayîbûna kapîtalîst, dewletnetewe û ligel avahiyên xwe felsefe-disîplîn-tevn-buyêr ya modernîst ku bi her awayî berebere weke disîplînekê dikemilî û teşe girt, bi qanda li Rojava, li Rojhilat jî, bi gişt pirsgirêka mirovan bi taybetî ya karkeran, girseyên kedkar yên tên pelçiqandin, mêjtin û xortan, mezin dibe. Ji ber ku modernbûna kapîtalîst ya ligel ronîbûna sedsala 18. teşe girt, tevî azadbûnê wekî hevdem mêtingerî jî geş kir. Li Rojava tevî "azadbûna" kes, di heman pêvajoyê de, mêtingerîya civak / gelên Afrîka, Asya jî kûr bû.

Ronîbûna sedsala 18. ji aliyekî ve dema heş jî tê binav kirin. Azadkirna heş, ji nû ve bikaranîna kesê ku heşê xwe, zanîna nakokiya xwe, bû. Hêş ji xurafeyan azad dibe lê belê pir derbas nabe heş, şûna heşê afrîner zagonên modern digre û pê re jî heş veguhere heşê aborî; wê gavê ji alî zagonan ve tê zincîr kirin û hêza xwe ya afrîner û rexnegîr wenda dike. Qaşo kesê azad, xwe ji alî siyasî (dewlet) û civaka sivîl (semayeya serdest) ve xwe dorpêçkirî dibîne. Li şûna heş, cîhgirtina zagonan ango di hêza zagonan de dewletbûyîn, giyanê serhildêr ku ciyê xwe ji zagonên derveyî yên dewleta fonksiyonel re hiştin û mirovên dikevin rêveberîya heyokan… Evana lûtkeya buhrana şaristaniya senayî û modernîzmê ne. Heş bûye dewlet, dewlet jî îfadeya puxt ya zagonên semayeyê ye. Gava ku berpirsiyarên dewlet û sermayê; "rêzikên piyasê" an jî fermana pirtûka berg reşê (zagon û makezagon) dibêjin, ev tê wê wateyê ku heşê azad û afrîner bi bizavên ku bûne hêsîrê zagonên ku zanist têkvexwariye re cîh diguhere, heşîtî gihîştiye derheşî, zanist jî gihîştiye derzanistiyê. Sedemek bingehîn ya modernîzma ku tevgera xwe wenda kiriye, heş û zanist di bin fermana zagonan de veguherîna disîplînê ne.

Ligel şaristaniya senayî ya kapîtalîst standartbûn, di beşekê de pisporîbûn, hevdengbûn (senkronîze bûn) ango di heman demê de çûna her kesî ji bo kar û sermaye û hilberîna li merkezên xwuya civîn… Disîplîna rejima kedê ya Fordîst ku ji mêj ve ji Bakurî buhurîye Başûr jî têkvexwariye û gihîştiye sînorê geşedanê û ji buhranek kûr re rê vedike. Êdî vezîna standartbûnê, navendîbûn jî berbi hilberîna xwecîhî dere… Rejima kedê, di rêzikên artêş û siyasetê de ku disîplîna derveyî xwe dide der, bere bere di hundirê xênî de, heta têkiliya nav zarok û dê hatiyê veguhestin û jîyîna mirovî ji alî madî û derûnî ve bi her awayî li zincîrê xistiye… Ji ber ku ke-

sayetiya tê pîrozandin cîhana derûniya mirovî şorex kiriye, wekî daringî li dewletên herî dewlemend yên mîna Belçîka, Swêd û Siwîsre rêjeya kesên xwe dikujin gihîştiye rêza yekemîn… Demokrasiya temsîlî ya parlemenî bêîqtîdar maye…

Êdî ji ?bi başkirina şid ya navgînên hilberînê re, burjûvazî hemû neteweyan heta bi yên herî barbar jî vedikşîne nav şaristaniyê" (Manîfestoya Kominîst. Ji beşa Bûrjûvazî û Proleter) wêdetir, ji demekê vir ve Bakur û Başûrî (yê "şareza" û yê "barbar") dikşîne nava buhranek kûr. Ligel ronîbûna sedsala 18. hin disîplînên ku pêşveçûna mîna rabûn, modernîzm û navendîbûn, kesîtîbûn;êdî û ji mêj ve piştî ku Çîn-Hindistan-İran Tirkiye-Misir ku "hatin vekişîn nav şaristaniyê" bûne nirxên vana jî. Nexasim di salên 2000 î de ku aborîya kapîtalîst ji ber vê jî, giraniya hilberînê ji Rojava vekişî Rojhilat; nirxên ku bi şaristaniya senayî ya kapîtalîst ve hevpişk in yên mîna aborî, siyasî û bere bere yên çandî, bûn / bûne realîteya civakên Rojhilat jî.

Gelên Filîstîn û Kurd hêna dewletên xwe yên netewî ava nekirine û hin gelên din yên ku dê pêvajoyek hevşib bijîn; dê gelek tiştan ji modernîzmê û disîplîn û avahiyên wê yên civakî, aborî, siyasî bistînin;ango merheleyên ku wê bijîn û biborînin dê hebin. Lê belê bi Rojava û Rojhilat ve bigiştî pirsgirêk û nakokiyên gelan yên bi modernîzmê pir dibin, dê pir bibin. Ji ber ku; ji sedsala 18. ve bi taybetî seranserî sedsala 20. ji kominîstan heta faşîstan, ji lîberalan heta muhafezekaran, ji humanîstan heta despotan hemû disîplînên siyasî; ji YCSS heta DYA, ji Fransa heta Çîn-İraq-Tirkiye, ji Kûbaya Sosyalîst heta Şîlîya Faşîst û paşîn heta bi Libya, hemû rejimên siyasî (dewlet û rêveberî) modernîst bû. Yê enternasyonalîst yê neteweperwer û heta yê mihefezekar jî modernîst bûn. Ji alî felsefî ve bête nêrîn; fitîrust, nihîlîst, romantîst, şoreşger, lîberal û heta bi qismen klasîst jî tê de herkes ji modernîzmê xwedî bû.

Pirsgirêka ku pê rû bi rû ne; bi vê avahî û tevna xwe î siyasî, îdeolojîk, heta felsefeya dijber û bi vê tevlîheviya xwe ve modernîzm, di sedsala 21. de nikare barê mirovahiyê hilgire û dê hilnegire.

Ji ber ku nikare hilgire, modernîzm, postmodernîzm wekî felsefî ji kolaja (buxçeya pînekirî) nû û kevn afirand.

Ji ber ku nikare hilgire, li şûna hewla buhurandina fordîzmê ya di rejima kedê de, postfordîzm (hilberîna sade, vezîn hwd.) dîsa mîna buxçika

pînekirî tevlîhevkirina nû û kevn radixe ber çavan. “Li her cihê ku modela Fordîst-Taylorîst lê hatiye buhirîn de, postfordîzm hem agahdarkirina ji nû ve xwedî lê derketina karkeran e, hem jî heta bi heta hebûna karkera ya kesî bi temamî tê bend kirin, çi bigre bi temamî gavek ji par re çûn ya berbi girêdana wan e.” (Andre Gorz, Yaşadigimiz Yer, r. 50, Ayrinti Yay.) Ango bi daneyên “agahdarker” ya dahatû ya nû, wekî kevn ?ji par re çûn” jî, ji bo karkeran pratîka koletiya çaxa navîn dide jîyîn, di bunya heman palûke an şîrketê de tê jîyîn.

Ji ber ku nikare hilgire, modernîzma ku pêşiyê di kevneşopiya Awrûpa de, di her qadê de ji rabirdûyê qetandin temsîldikirî, niha ji nû ve kevneşopiyê, rabirdûyê himbêz dike. Bi hewlên di navbera buhurandina netewîtî û vegera bo netewîtiyê de modernîzm bênefes dimîne.

Ji ber ku nikare hilgire û ji ber ku modernîzma Rojava ku sînorên siyaseta aborî ya pêşveçûnê nikare biborîne, YKSS û rejimên sosyalîst yên din, wekî serdestiya çand ya civakê, bêyî bigihîjin kominîzmê ruxuyan.

Kominîst, gava ku modernîzm û disîplînên wê yên berbiçav rexnebikin û lê bipirsin; li şûna wê wekî alternaîf ne ku postmodernîzm an jî “koşka elektronîk” “kapîtalîzma ku ne kapîtalîzm”, “teknokratan” an jî “civaka agahdariyê” hwd. deynin ku evana alternatîfên ku kapîtalîzmê derbasnakin, divê alternatîfê li derveyî milkiyeta kapîtalîst ya taybetî û rejimên siyasî, bigerin. Ev alternatîf, wekî rejima derbasbûnê sosyalîzm û wekî armanca nîhaî ya civakê, çand serdest kominîzm e ku di vê rewşê de disîplînên ku siyasetê li navdixe dê were buhurandin. Di jiyana mirov û civakê de, civaka kominîst ku li dijî zagon û disîplînên spartî zagonan ku ev derveyî ne, çanda ku hundirî ye dê lê serdest be. Heger wekî pêvajoyek bêdawî moda-modern ku tumî pêşveçûnê, hemdemîbûnê, berbi nûbûnê temsîl dike; divê ev ne bi hilbera modernîzm ya hilbera sedsala 18. ya ku bere bere veguheriye disîplînek şaristaniya senayî, neyê sînor kirin, ji ber vê, ne civaka kapîtalîst ya ku ?bi bendên ling yên nav xwe” rû bi rû dimîne û dixitime, ancax sosyalîzm / kominîzm ya bêdawî ya dê hilbera dînamîkên şoreşa sedsala 21. ne, dikare wekî pêvajoyek bêdawî ji heqî hemdemîbûnê ji nû ve derkeve. Ancax sosyalîzm û pêvajoya wê î jor kominîzm ya çand serdest kare zanistê û heş ji bindestiya zagonan derbixe.

Wekî Tevgera Kominîst ya Kurdistan, ji xwecihî li cîhanê nêrîna me ev e.

ŞARİSTANİYA SENAYÎYÊ XWEZA Û MİROVÎ BER Bİ TUNEBÛNÊ VE KAŞ DİKE

Şaristaniya senayî ya kapîtalîst di nav pêvajoya geşedanê de ligel ber bi merhela xeridîn û ruxînê ve diçe, xwezayê û mirovahiyê jî bi xwe re kaşî felaketê dike. Kapîtalîzm bi qanda ji alî jeopolîtîk ji demekê vir ve ji alî ekolojîk ve jî dinyayê tehdît dike. Çawa ku dîroka wî (ku dîroka ew çêdikin) û tekamûla wî heye, dîroka dinyayê ku ew jî parçeyek organîk yê wê ne û di nav vê dîrokê de tekamûla dinyayê heye. Midaxeleya îradî ya şaristaniya senayî ya kapîtalîst ji bo erdkûreyê, di van salên paşî de ku pir jê tê qal kirin, hevsenga ekolojîk ya dinyayê xera dike. Ji ber ku erdkûre û xweza li şûna ku tekamûla xwe bijî, bi giranî tûşî midaxeleya der tê.

Dinya jî mîna organîzmayek jîndar, ligel hevsengên hundir û der tevdigere. Bi kurtasî dinya me jî xwedî pirsgirêk ku li ser hevsengên xwe yên der û hundir û siheta wê girîng neyê dîtin, dê nexweş bikeve û sicara wê bilind bibe. Bilind jî bûye, ji ber ku em bêhtir bi heqîqeta germa kûrewî re rû bi rû dimînin. Û berpirsiyarê vê sicarê ji sedî nod bizawên mirovahiyê ne.

Ligel vedaxistina teknolojîk ya zanistê mirovê ku serdestiya dijî xwezayê bidest xistiye, ne di ferqê de ye ku sînorekî wê heye, an jî vî sînorî paşguh dike, ji midexeleya îradî ya xweza û dorhêlê, wêdetir, bêgiram û bi dijminantî tevdigere, heman xweza dê bedêla vê bizavê bi giranî bistîne. Dest bi standinê kir jî. Engels bi gelek salan berê, ji vê hêlê ve hişyariyek wiha kiribû:

"Lê belê divê em zafera mirov ya li ser xwezayê nenepixînin û xwe nepişpişînin. Xweza dê heyfa her cure van zaferan hilîne. Raste; her zafer, berê encamên ku em li bendê ne diwelidîne; lê paşê gelek ciyawazî, tesîrên pêşnedîtî û piranî tesîra encamên ku berê bidest ketibûn ji holê radike, dike. Gelên ku li Mezopotamya, Yunanîstan, Enetolê û li derên din, ji bo araziyê çandiniyê bi dest bixin daristan şewitandin, nizanibûn ku merkez û gencîneyên nemê jî tunekirine…Loma di her gava me de, mîna ku em derî xwezayê ne, li ser wê, ticaran weke fatihekî ku li ser gelekî biyanî serweriyê bike, - lê belê divê em zanibin ku bo goştê xwe, bi mêjî û xwîna xwe em aîdî xwezayê ne û tam li navenda wê radiwestin, serwerîya me ya li ser wê, di eslê xwe de tenê hînbûna rêzikên wê û kêrhatina bika-

ranîna derbarê vê piratîkê de em ji afirendeyên din bi awantajtirin- bi bîra me dixe. "(Yê radigihîne Alex Callînîcos, Antî-Kapîtalîst Manifesto. Hêjmar 49, Weşanên Lîteratur)

Bi kurtasî di koka xerabûna ekolojiyê de tevgera burjûvazî ya kuştina xwezayê ya bêhtir kar-mêjtin û bi xirsa destxistina milkiyeta takekesî heye. Di xerîdîn û hilberîna li ser erdkûreyê; ji ber berdana kildûmana avê, azot oksît, metan, karbondîoksîtê, li hember hemû hişyarkirinan bilez zêde dibe, bi taybetî jî emisyonên xazê ku ji trafîk û senayiyê derdibin sicara erdkûreyê "2 pîle" bilind bûye. Mirovên zanistê, germbûna okyanûsan û helîna qatê qeşayê yê Gronlandê bi vê geşedanên ve girêdidin. Di berdana gazên sera yên bo atmosferê; bi rêzê YDA, Awustralya, Kanada hwd. dewletên geşbûyî yên emperyalîst- kapîtalîst, ango navendên şaristaniya kapîtalîst serî dikêşin.

Hevpeymana Dorhêlê ya Guhertina Sirûştê" ya ji alî NY ve ya li Kyotoê hatiye amadekirin, ne belgeyek di rewşa ku karibe li dijî germbûna Kûrewî têkoşîn pê were dayin. Belge, li dijî felaketek ekolojîk reformên cidî jî têkvenaxwe; ji ber ku grûbên ji semayeyê wêde bakurê dewlemend yên emperyalîst, ku ji tunebûna jiyana peykê agahdarin jî, livbaziyên xwe naguherînin. Sicara Kûrewî, gav bi gav berbi merheleyek krîtîk ya veneger ve pêş ve dere; xweza jî bi refleksa xweparastinê dest bi nîşandana reaksiyonên cidî kir. Zêdebûna şewata daristanan, pêlên hewa germ, kêzikên zîreetê, lehî û brûskên ji nişkê ve, zuwahiyên ku tunebûnê; zêdebûna asta bilindbûna ava deryayê, mezinbûna xetereya binavbûna bajarên ber deryayê, xetereya bêav mayina bimilyaran mirovan û di salên paşiyê de pêkhatina bahozên bihêztir…. Evana çend ji felaketên mezin in. Heger morovahî vê dijberîya xwezayê cidî negre û gavên pêwist navêje, rû bi rû mayina raberî dij êrîşa xwezaya ku her tiştî bimale û paqij bike dê jê veneger be.

Di rîya çareserkirina bilez de pêwist e gavên lezgîn werin avêtin. Bi kêmanî, mirovahî, ji bo daxistina sicara kûrewî bi gav avêtinên pêwist rû bi rû ye. Çareserîya esil, ango rihetbûna xwezayê ya paşîn jî ancax, bi dawîkirina sazûmana xerîdar-hilberîn ya kapîtalîst ya ku kar û mêjtinek bêdawî û bi derbasbûna aborîya hilberî û xerîdarî ji alî diviyahiyên jîyanî ve, gengaz e. Ku ew jî bi pêkanîna guhertinên bingehîn yên mirovan yên derbarê dorhêl û xwezayê gengaz e. Ango di çapa dinyayê de, bi guher-

tinên bingehîn yên şoreşger ku dê paşî li şaristaniya kapîtalîst bîne, ancax rizgarîya mirovahî û xwezayê dê pêk were.

KUREWÎBÛN, EMPERYALÎZM Û GEŞEDANÊN NÛ

Kozmopolîtîzm / gerdûnîbûn ango bi biwêjek ku di salên paşîn de bûye moda, kûrewîbûn ne nû ye. Rehên wê heta, dema ku mirovahî, piştî helîna qeşayê derketin derve û li şûna hevdan û seydvaniyê ya ji bo li pey bazdana diviyahiyên xwe;derbasbûna şoreşa werzeyê ya wekî li gund-bajarê ewil bi cîh bûne, dirêj dibe. Li hîlala biadan gund û bajarên pêşîn ku her lêgerîna qalikên xwe yên aborî, civakî, çandî ku bo sînorên xwe derbas bikin, gavên pêşî yên gerdûnîbûnê ne. Ev gavên nû li nav civakên gund-bajarên kevnar yên li rex Dîcle-Ferat, Nîl Ganj û Huang Hi (Çemê Zer) hat jîyîn.

Riya hevrîşmê ku ji qiraxên Deryaspî destpêdike û sero-bin ku ji Asyayê heta Çîna kevn dirêj dibe; pira hevakam ya têkiliyên nav gel / civakan yên li vê erdnîgarîya fireh ya siyasî, leşkerî, bazirganî, bi qanda vê jî çandî, felsefî ya li vê erdnîgarîya fireh de bû. Li ser vê rîya karwanan ya ji qiraxên Deryaspî heta Kurdistan - İran- Afxanistan-Pamîrê dirêj dibû, bi navberên diyar, cureyek Herêmên Serbest yên wê demê ku jê re "Qûleyên Kevirîn" dihat gotin; li van deran bazirganên ji Rojhilat û Rojava dihatin, hevûdin didîtin û danûstandinek dewlemend pêk dianîn. Ligel trampekirina malên bazirganiyê, "ligel herkên felsefe û olî (Budaî) di warê pîşeyê de jî ragihandina nimûne û kevneşopî (Pîşeya Helenî) rola sereke lîst" (Larus a Mezin) divê bête gotin ku gerdûnîbûn / kûrewîbûn ne nû ye.

İmperetorîya Pers ya ku 300 salan ji Hindê heta Balkanan serwer bû; dijê vê ji Balkanan ta Hindê İskenderê mezin li ser gotina "İmperetorîya dinyayê ya spartî yekîtiya dilan" her çend spartî hêza çekdar bûn jî li erdnîgarîya ji Balkanan heta Hindê, derbasbûnên leşkerî, siyasî, çandî hatiye jiyîn.

Hê weha bû, bi gavên mezin ku di wê pêvajoyê bilez bikin, ket dewrê. "Burjûvazî bi mêjtina bazarekê re fonksiyonek kozmopolît da hilberîn û xeridîna her welatekî. Kevneperest di kederek kûr de xeniqand, ji bin lingên senayiyê, bingehê netewî yê ku li ser radiweste kişand û girt. Hemû senayiyên netewî ku bere bere hatibûn avakirin ruxiyan û hêna jî diruxin… Şûna girtîbûna xwecîh a kevn û netewî, têra xwekirinê em dibî-

nin ku hevgirêdanên hevraber yên pir layen cîh digrin" (Manîfestoya Kominîst. R. 114. Weşanên Çep) Marks – Engels gava ku di Manîfestoyê de, ne bahsa "kişandin" an "ruxandin" a bingeha aborîya dewlet-neteweyên modern yên roja me; wekî senayiya xwecih (netewî) ya girtî ya xasî feodalîzmê, ku ji alî senayiya mezin ve dihat ruxandin qal jê dikirin û bi vê yekê di heman demê de bahsa meyla kûrewîbûna sermayeyê jî dikirin. Paşiyê jî Marks ?bi hevkarîya di nav neteweyan re, ku ruxandina gelek cure neteweyên ku têraxwebûna wan têk dere, dîrok jî bere bere dibe dîroka dinyayê" (İdeolojiya Alman. r. 66) digot û makîneya ku li Çîn û Hindê nanê bihezaran kedkaran ji dest derdixe, li İngîltere îcad dibe re, "ev îcad buyêrek dîroka gerdûnî ye" dê bigota. Marks-Engels, ku înterneta sanal ya otorêya agahdariyê, hecma bazirganiya di navbera Çîn û YDA ku digihîje 500 milyar Dolarî, veguhestina senayi ya navbera parzemînan, hecma ku borsa gihîştiyê û erdnîgarîya ku lê belav bûye di asta gerdûnî ya bejayî, derya û hewayê, hevgirêdana enerjiyê ya di navbera Rojhilat û Rojava de û ya paşî, pêvajoya YA bidîta, gelo dê ji bo dîmena "hevgirêdana hevraber ya piralî ya neteweyan", ji bo meyla sermayeyê ya buhurandina dewletneteweyê û fonksiyona hilberîn û xeridîna her welatî ya kozmopolît re dê çi bigota, mirov miraq dike.

Ji duh heta îro kozmopolîtîzm (kûrewîbûn) wek pêvajoyekê û helbet dibin akama siyasî, îdeolojîk, çandî ya aktorên kûrewî ya herêmî, xwecihî ya her dewrê de xebitî, geşbû, geşdibe.

Komîna Parîsê, Şoreşa İlonê û pêngava mezin ya sosyalîst ya sedsala 20. jî, meşa di rîya dirêj ya ku dere kominîzma hemdem de; di perspektîfa gelan û kedê de gerdûnîbûn bi xwe bû. Bi şoreşên li pey Şoreşa İlone ve, li Awrûpa û dinyayê, karibûya derbên mirinak yên paşîn li sîstema emperyalîst-kapîtalîst bidana, ango li nîvê rê nexitîmîbûya û nemayibûna; ev pêvajo di bin bandora ked û gelan de rakirina sînor û paseportan; di qada cîhanê de, newekheviya di nav gelan / civakan ya di her qadê de hevkarîalîkarîya enternasyonal û derbasbûna raberhev ya wekî civakî çanda dewlemend entegrasyona tora têkiliyan, kûrewîbûnê re, rê vekirana. Misyona ku ji vê hêlê ve li şoreşên sedsala 20. barkirî, piştî xitimîn û ruxandina rejimên sosyalîst re ev fîîlen dewrî şoreşên sedsala 21. bûn.

Burjûva, bi taybetî ji sedsalên 1990 î vir ve; ji aboriyên netewî yên ciyawaz û balavbûyî wêdetir û ya girîng li bazara navnetewî û hevkariyê,

sermaye bi guhaztina senayî – teknoojî û meta re, di armanca afirandina bazara dinyayê de pê li xazê kir, di vê yekê de, du faktoran, rola diyarker lîstine.

Yekemîn; ruxîna bloka sosyalîst û YKSS, vekişîna pêla şoreşa sedsala 20. û ji par re çûna cidî ya di tevgera karker û kominst de, sermaye, bi rizgarîya wekî ji zexta ji çep ya sosyalîzmê di demek kurt de ku hevdana gavan, borandina aboriyên netewî, girêdanên ling didît, pêvajoya kûrewîbunê da lezandin. Ji ber dîtibûn ku di demek nêz de xeyaleta kominîzmê dê çekê ji dest bigre û berî bidiyê, ne li Awrûpa ne jî li dinyayê nemabû. "Giştîbûna ku sermaye bêrawest berî didiyê" ango lêgera kûrewîbûnê ku ji rûtînê wêdetir lez daye xwe de, di serî de ev faktor heye. Lê belê sînorên kûrewîbûnê yê ku sermaye aktorê wê ye, sînorên xwe hene. Ev sînor ji aliyekî ve ji "lingirêk" an jî ji bariyerên hundir yê sermaye bixwe "ji hundirê avahiya xwe" ye. Ji aliyekî din, wekî bitûniya tevgera pêşverû, şoreşger, kominîst ya dinyayê ku dê ji nû ve an dê vekêşîne sînorên netewî an jî bêyî ku vê firsendê bidê, dê bi temamî bavêje sergoyê dîrokê.

Duwemîn; barê krîza ku kûr dibe li pişta girseyên kedkar û bi giştî li pişta karkeran û bi taybetî li ser gel / civakên Başûrî belavkirin. Piştî ku tenê li Wîetnam, Çîn û Hindê nêzî 1, 5 milyar hêza kedê ya bi mûçe ya erzan, rasterast an nerasterast ji mêjtina sermayê re vebû; hem barê krîzê ji nû ve li Başûrî belav bû û hem jî di serî de betalî pirsgirêkên hêza kedê ya Bakurî (YA, DYA) giran bûn. Di salên paşîn de siyaseta neolîberalîzm û kûrewîbûnê ya kapîtalîst bi armanc hate lezandin û di çapa dinyayê de ji nû ve rê dide mêtingehkariyê. Ewqas ku di vê pêvajoyê de, emperyalîst-kapîtalîzm tevî gelê xwe, morovahiyê wekî madî, derûnî ji nû ve dike mêtingeh.

Li dijî encamên kapîtalîzma ku kûrewî dibe; ji formên sivîl yên civakî ta çepgirên neteweperwer yên netewî, ji şîrketên zîreetê yên biçûk û navîn ta herkên dorhêlê û heta bigihîje girseyên kedkar, karkeran, tevgerek fireh ya mixalefetê mezin dibe. Bi qanda dîrokî ye, yê rojane armanca kominîstan;vê mixalefeta ku di baweşîngek fireh de ye raberî encamên kapîtalîzmê yên ruxanker bide rawestin.

Yên teza "împertoriyê" hildiberînin ligel ji trenda kapîtalîst ya kûrewîbûyî bi rê dikevin û diyarde û hûrandinên Lenîn yên derbarê emperyalîzmê de, buhurîne, dibêjin. İro yên serkêşiya van tezan dikin M. Har û A. Negrî:

"Ancax em ku dibêjin 'împeretorî' ji 'emperyalîzmê' bi temamî qesda tiştekî ciyawaz dikin"; "İmperetorî navgînek rêveber ya bêxak û bênavend ku hemû erdkûreyê dixe nav bihûdên xwe yên fireh û vekirî ye";ji ber ku "têgiha împeretoriyê di bingeha xwe de bi tunebûna sînoran ve tê wesfandin"; leza xwe kêm nakin û "em dibînin ku împeretorî rejimên zalim yên îqtîdara modern ji holê radike û di heman demê de potansiyela azadiyê fireh dike"; "damezrandina împeretoriyê tê wateya kûrewîbûna têkiliyên çandî û aborî", "Di heman demê de ji fikra împeretoriyê ya di komarek demokratîk de" "YDA împeretoriyek hemdem e" dibêjin û wê wekî adresê nîşan didin. (İmperetorîr. 18-19-20-68-183-197 Weşanên Ayrintî)

Bersivandina van îdea û yên wekî van, derî guncana vê belgeyê de ye. Yên ku em bêjin tenê têkiliya di nav buyêra emperyalîzmê de û dê sînorkirî be.

Rêveberîya bênavend û bêxak ancax di civaka kominîst ya çand serdest de dikare pêk were. Bi giştî, di şertên milkiyeta kesî û bi taybetî di şertên rejimên siyasî û kapîtalîzmê de ev ne gengaz e. Di şertên kapîtalîzmê de, ne rêveberîya bênavend û bêxak, lê belê ya ku nêzî rêveberîya navendiya parzemînî ye û ku ber bi vê ve gavan davêje, ne DYA ye, YA ye. Ku pêvajoya YA, çawa bi bariyerên hundir û derve re rû bi rû dimîne an dê bimîne tê dîtin. Wekî din, ligel hebûna ji 200 dewletên netewî, federal; hebûna nîskokên emperyalîst yên mîna YDA, Rûsya, Çîn, YA û Japonya yên diyar, teza "împeretorîya bênavend, bêxak" dirizîne.

Yên ku împeretoriyê "komarek demokratîk" û YDA jî "împeretoriyek hemdem" dibînin û pêşkêş dikin û gava ku wekî "rejimên zalim yên rêveberîya modern" Talîban, îqtîdara Sedam Hisên ji alî YDA û mitefîkên wê ve hatin ruxandin, bêyî wahşeta ku wan nîşan da, bê dîtin, yên ku di bin paletên tenkan de "potansiyela azadiyê pir dike" dibêjin, li holê ye ku YDA, li Asyayê, di bin perdeya "azadî" yê de li pey kîjan berjewendiyan e û ligel ku Siltanê Misrê yê kerr jî bi vê yekê hesiyaye û bêyî vê bibînin û yên wê "komara demokratîk" an jî "împeretorîya hemdem" îlan dikin; an ji alî heş ve kor in an jî parêzvanên emperyalîzmê yên şerletan in.

Em wekî Tevgera Komînîst ya Kurdistanê; teza împeretorî û wekî ku pê ve girêdayî van dîtinên hatine hilberandin red dikin, gazî redê dikin. Pêşnumeya "împeretorîya dinyayê" ya felsefevan Gîambattîsta Vîco û zanistê siyasetê Montesque ev, "Koma Dewletên mezin" ya bi zagonên giştî

ve girêdayî ya Hugo Grotîus, Danezana Mafên Mirovan 1789 ya Fransiz, teorîya "aştiya ebedî" ya İmmanuel Kant, fîlozofê Sînopî yê dibêje "welatiyê dinyayê me" ancax û ancax di civaka kominîs de ya ku Marksîzmê ku di Manîfestoya Kominîst li ser van utopya û gavên dîrokî hilberiye hatiye pêşdîtin de, "bêmerkez, bêxak û bêsiyaset civakên komînal yên dewlemend bi biratî û yekîtiya wan ya azad dikare pêk were. Dinyayek wiha; utopya gelan e, utopyaya me ye jî.

Tehlîla emperyalzmê ya Lenîn, bi xetên xwe yên giştî ve, hêna jî rewaca xwe diparêze; lêbelê hin geşedan jî divê neyên piştguh kirin. Li parzemîna Awrûpa, pêvajoya gavên ji dewletneteweyê wêdetir têkvedixwun, du dewletên emperyalîst yên Awrûpa û bi şerên navbera wan yên bixwîn tên nasîn Almanya û Firansa û helbet sermayeya İtalyayê, perên netewî, sînor, al, sembol û nirxan di leha nirx û sembolên YA de ku li paş dihêlin, ji nav grûbên sermaya navnetewî geşedanek berbi qartelên sermayê yên ji netewe wêdetir hwd. ku tê jiyîn; ev tên wê wateyê ku hin geşedanên nû hene. Lê belê ji van geşedanan, divê behsa "împeretorîya wêdeyî netewe" an jî "ultra emperyalîzm" ê neyê krin. Ji ber ku raberî van geşedanan nakokî û pevçûnên di nav wan û van navendên hêzê yên emperyalîst de, didomin. Ligel bi stratejiya serdestiya Awrasya ya YDA re meyla pêvçûn û nakokiya nav emperyalîstan ji nû ve kûr dibe. Tifaqa emperyalîstan ya li ser Afxanistan ku ji ber wesfa Talîban û germahiya êrîşa 11 İlona 2001 ê pêk hatibû, bi êrîşa İraqê re xerabû, heta ciyê xwe ji bezandinên neyekser re hişt. Dagirkirinek leşkerî ya İranê jî, dikare meyla pevçûnên yekser yên navbera emperyalîstan, ji nû ve biafirîne. Ancax hebûn û mezinbûna sermaya YDA û yên din yên Çîn û Hindê, dijberê vê jî îxracata Çîn û Hindê ya bo bazarên YDA, YA, Rûsya ku bere bere pirtir dibe; wekî din bi zewaca şîrketan ya wêdetirî netewe, ger li welatekî emperyalîst yê X, Z ger hevkarîya van ya ligel welatê sêyemîn ku pir dibe, pevçûnek yekser ya di navbera emperyalîstan de freh dike; ku ji dewra Lenîn ciyawaztir, ji ber çekên nukleerî, şerekî di navbera emperyalstan de, tevî wan hemû mirovahiyê heta ku heqîqeta erdkûreyê bi bitûnî dixe bin gefan jî tevlî vê bibe; evana hemû îhtîmala şerê nav emperyalîstan yê yekser kêm dike, lê bi temamî ji holê ranake.

Nakokiya nav mêtingeh û gelên bindest; ligel tesfiyebûna saziya mêtingehî ya klasîk, bi şeklî hatiye borîn. Di serê sedsala 20. de, ji xeynî

îstîsnayan, pirsgirêkeke dinyayê ya wekî mêtingeha klasîk êdî nîne. Lê belê emperyalîzma li Başûrî ku ji ber derî hatibû qewitandin, ligel ku di pencirê re dîsa ketiye hundir; nakokiya navbera gelên Amerîkaya Latîn, Afrîka, Asya û emperyalîzmê tûşî guherînê bûye. Bihûdê siyasî yên nakokiya tazî ligel ku lawaz dibe; bi têkvexwarina aborî, civakî, çandî ve layenên wê yê civakî-çînî derketiye pêş. Serxwebûna netewî ku layena (armanc) diyarker ya şoreşên tevgerên rizgarîya netewî ya Afrîka, Asya ya li sedsala 20., di sedsala 21. de ciyê xwe, ji şoreşên civakî ku serxwebûna aborî jî armanc dike re hiştiye. Êdî şîara ?Hemû karkerên dinyayê û gelên bindest yekbin" di roja me de ji rewacê derketiye. Ji ber bi awayekî diyarkirî li çapa dinyayê pirsgirêka netewî hatiye pişkaftin, li şûna vê divê "Çîna karker ya dinyayê û gelên tên mêjtin biyekbin" bête gotin.

Li Bakurî para zîreetê di Hevdana Hasilata Netewî ya Nesafî de" (H. N. N) ji %3 û heta ji % 10 ji par re çûye, ango wekî hevalbendê çîna karker gundîtiya biçûk û navîn ji hêzek ku bahs jê bête kirin derketiye, ligel mezinbûna têketinên teknolojîk yê zîreetê, bi hêjmarî tê dîtin ku karkerên zîreetê jî jar bûne.

Ji ber, weke diyarbûyî buhurandina tekoşînên serxwebûnê yên netewî, ji ber hem geşedanên kapîtalîzmê ya ufkî û qincî, gundîtî; bi awayê burjuvaziyê xakê û zîreetê, gundîtiya biçûk û navîn û karkerên zîreetê, perçe bûye. Ev, wekî pêvajoyekê didome. Ji ber vê yekê li Asya û Afrîkayê jî bingeha tifaqa giştî ya karker-gundî, ji holê rabûye, radibe. Êdî, mîna ku şoreşên siyasî yên ku burjûvazî dê pêşengiya wan bike nayê jîyîn, faşîzma vekirî an jî rejimên leşkerî li derve bête hiştin, stratejiyek şoreşê ku bi burjuvazî re tifaqê têkveduxwe êdî nikare bête armanc kirin. Li şûna vê tifaqa karker-gundiyên kedkar (xizan) ku dê li gor rewşa welatekî ku teşebigre, divê ji alî tevgera kominîst ve were rojevandin.

DÎROKA JÎ NÛ VE LÎ LAYENÊ DİGERE Û TEKOŞÎNA SOSYALÎZM Û AZADİYÊ

Sosyalîzma reel ruxiya ancax, sosyalzîm bi bin neket. İdeayên "Sosyalîzm, bi binketiye", "kominîzm çewtiya dîrokê ye" bêvac bêspartek in. Kominîzm (kominîzma îptîdaî) navê sosyalîzmê ku mirovahî, di raboriyê de, bi hezaran salan berê, di nav wekhevî, azadî û biratiyê de jiyabû, ye. Çewtiya dîrokê an jî ji rê derketina mirovahiyê ya mezin; ji cavaka îptîdaî

ya ewil, berîdayina sazûmana mêjtin, bi çîn, bi milkiyeta takekesî ye. Çewtî an ji rê derketina dîrokî ya mirovahî ev e û mirovahî bi hezaran sal, bi taybeî 150 salên vê paşiyê, ji bo, li hevrastkirina vê çewtiyê têdikoşe. Di sedsala 21. de şaristanî û dîrok ji nû ve di lêgera layen û têkvexwarinê de ye. Dînamîkên gelên karker kedkar û kominîst, şoreşger, pêşverû, ji bo dîroka ku ji nû ve li layenê digere, şerê têkvexwarinê têvlêbikin dikin, bi vê yekê mirovahî, ji bo ji binî ve borandina çewtiya xwe armanc dike.

Di sedsalên 19. û 20. de; karkeran, yên tên mêjtin, gelên bindest-mêtngeh ji bo azadî û sosyalîzmê şerên dijwar kirin, li guherînên girîng yên şoreşger îmze danîn. Sedsala 19. bi temamî ne serdema burjuvazî ne ya proleterya ye. Pêvajoya derketina serdema şoreşên burjûva û derbasbûna şoreşên proleterya ye. Komîna Parîsê ku di çaryeka paşî ya sedsala 19. de pêkhat, hemû bar, tengasî û pirsgirêkên vê derbasbûnê hilgirtibû û ancax 71 roj karibû bijî.

Sedsala 20. serdema şoreşên proleter e. Çîna karker ya dinyayê û gelên mêtingeh-bindest rabûn serxwe. Ligel çîna karker ya Awrûpa gelên Rojhilat jî di lêgera azadî û sosyalîzmê de bûn. Bitûnê van dînamîkan, ders derxistina ji sedsala 19. û bi taybetî ji Komîna Parîsê re, di sîstema emperyalîst-kapîtalîst de baxorên cidî vekirin, cîh bi cîh derbên mirinak lê dan. Lê belê dînamîken şoreşger û pêla şoreşê yên sedsala 20. di çapa dinyayê de wekî paşîn neborî. Di serî de YKSS rejimên sosyalîst, di dewreyek geşedanê ya xuya de xitimîn û ruxuyan.

Doktrîna lîberal pirsgirêka azadiyê di çarçeweya dewletê de anî holê, raberî vê, Marksîzmê heman pirsgirêk wekî dewleta ku nedewlet bi perspektîfa dewleta derbasbûnê ango bi asoyeke firehtir hilda dest. Lê belê rejimên sosyalîst; ya di teoriyê de hatibû pêşdîtin, derbasbûna ji dewletê berbi bêdewletiyê pêk neanîn, li şûna ku gav bi gav vemire, dijê vê bihêz bû, ji ber vê jî belaya bîrokrasiyê bû sedema ruxînê. Serdestiya gel di pêvajoyê de veguherî îqtîdara partiyê, kulta siyasî ya partîserdest nehat borîn.

Şoreşa Îlonê ku navendîbûna Rojava (Awrûpa) borand, hewleke mezintirîn ya Rojhilatê bû, lê belê bigiştî dînamîka şoreşger ya sedsala 20., bi taybetî YKSS di pêvajoyê de modernîzma Rojava û siyaseta aborî ya pêşketinî neborand. Sosyalîzma reel, kaniya enerjiyê ya fosîl ku yekîneya enerjiyê ya şaristaniya senayî ya kapîtalîst bû, neborand, ji dewreke geşe-

danê şûnde ev jî bû sedemek din ya xitimîna wê. Li ser kaniyên enerjiyê yên fosîl, merhela kominîzmê ya jêr hat avakirin ancax nikaribû derbasî civaka kominîst ya ku çand serdest û bêdewlet ku dewlemendiyek pir pêwist bibîne, bibe. Derbasnebû!

Tevgera kominîst ya sedsala 20. gava ku bi rê ket "her tişt bo mirov" got; lê belê di rejimên sosoyalîst de, kes û azadiya kes, di bin giraniya dewleta bihêz û civakîbûn, kolektivîzmê de hat ji bîr kirin, hat pelçiqandin. Biyanîbûna kes, ji rejima xwe ya sosyalîst re kûr bû, rejim bêxwedîbêparastin ma û ruxiya. Çimkî her veguherek civakî; pêşveçûna teknîk, bi qanda ku pirsgirêkek aborî û siyasî ye, pirgirekek derûnî, zîhnî ye jî. Veguherîn û pêşveçûn tenê bi regezek daringî ve sînorkirî bûya Swed, Swîsre, Belçîka bi xwekuştinan, di dinyayê de, herî li pêş cîh nedigirtin. Neafirandina kesayetiyek ku wekî derûnî û azad dewlemend, sedemek ruxandinê ya din bû.

Sazûmana mêjtin û milkiyeta kesî ku rehên wê digihîje çend hezar salan û aîdîyet, hînbûnî, girêdayina daringî, çandî, siyasî afirandibû bi cidîyet hat qelaştin lê ji bin ve û wekî paşîn nehat borîn. Ev vatinî ma li ser milên dînamîkên şoreşger û şoreşên sedsala 21.

Ji hevdana vana giştî, pêla şorêşê ya sedsala 20. ji par re vekişiya, dînamîkên ku hilberînên vê pêlê bûn xitimîn an jî belav bûn û bi layenekî diyarker ji nû ve veguherîn kapîtalîzmê. Ev pêvajo didome. Dînamîka şoreşger ya sesala 20. di çapa dinyayê de, ji ber ku şaristaniya senayî ya kapîtalîst-emperyalîzmê û tevna wê ya modernîst ku nikaribû biborîne ji nû ve veguherî wê. Di vê pêvajoyê de tevgera kominîst jî wekî diyarker veguherî tevgerek nû ya sosyal-demokrat û vediguhere.

Di salên du hezaran de tevgera kominîst ya dinyayê, divê berê, bi qetandinek cidî jê xelasbûna siyasî ya sedsala 20. bike armanc. Di dîrokê de her demê qetandin û berdewamî li rex hev geş bûne. Her qetandinek, di heman demê de wekî pirek navbera rabirdû û dahatû timdomiyê jî têkveduxwe. Tevgera kominîst îro; Marksîzm û teorîya zanistî ya sosyalîzmê û rihê şoreşger ku êrîşî asîmanan dikir ya sedsala 20. divê bingeh bigre û timdomiyê; lê belê divê ji bernameya siyasî ya xwerûyî sedsala 20. terza tekoşîna pratîk û girîngtirîn jî, bi avahiya kominîst ya kevn ku veguheriye tevgerek sosoyal demokrat ya nû ya mîna bi layenê diyarker neteweperwerîya çep an jî çepê lîberal re divê bendên xwe bi qetîne û veqetandinê

pêk bîne. Tevgera kominîst ya sedsala 21. bi vê qetîn û timdomiyê dê ji nû ve teşe bigre, divê teşe bigre. Em kominîstên Bakurê Kurdistanê qetîn û timdomiyê di vê bitûniyê de, dixwazin geş bikin.

Di sedala 21. de, di lêgerîna sosyalîzmê de, li ser bingeha Marksîzm û sosyalîzma zanistî, nûjenkirina hilberîna teoriyê ji bo çareserkirina gava yekemîn e; gava duyemîn bi têkvexwarinek ku bi esasî çalakiya yekser, tekoşîna pratîk ku dê tevlê bikê ve, dê pêk were. Bi taybetî pêkanîna bitûnîkirina organîk ya kesayetiya azad û civakîbûn û kolektivîzmê, divê bibe armancek tekoşîna piratîk û teorîk. Îro, gava ku em ji nû ve berê xwe bidin şerê sosyalîzmê, divê berê mirov ji ziliyeta xwe rizgar bibe. Divê bête zanîn ku rizgarîya mirov, ne tenê kar, xwarin, sitirîn (ku tenê ev bûna, sosyalîzma reel ew pêk anîbûn) e, azadî, estetîk, dewlemendiya derûnî hwd. divê bi zanebûna ku bêtir tiştan têkveduxwe, şer bête geş kirin. Azadbûna mirov, berê borandina hesta xwedî derketina milkiyeta kesî û ji ber vê borandina ji xwe re biyanîbûn, divê were heş.

Dijberîya kapîtalîzmê îro, li gora sedsala 20. di çapa dinyayê de bihêztir û ji kûr ve geş dibe. Çi rêxistinên sivîl yên civakê ku tenê li dijî encamên kapîtalîzmê, dînamîkên forumên civakî, çi jî ligel dijî encamên wê dînamîkên kominîst, şoreşger ku li li dijî wê bixwe ne, herkes bi teşeyekê raberî kapîtaîzmê helwestekê nîşan dide. Di serî de çîna karker, tebeqe û çînên di bin zextê de ne û dipelçiqin, her avahî û herkek siyasî ya muxalîf, bere bere di eniyek dijberî kapîtalîzmê de dibin yek. Kapîtalîzm, di dîroka xwe de, ti caran ewqas kûr û tazî nehatibû lêpirsîn.

Li dijî îmkanên ku makînebûnê di hilberînê de, bidest xistiye; betaliya ku wekî felaketekê mezin dibe û bîhntengiya ku diafirîne; hawara kedkarên zîreetê ya li dijî siyaseta wêranker ya tekelên zîreetê; dînamîkên ku xwecîh têkvexwarinê tevlê dikin yên li dijî dorpêçandina çand û meta yên emperyalîst; lêgerîna rizgarîya civakî yên gelên Asya, Afrîka ya sedsala 21. ku di sedsala 20. zincîra mêtingehkarîya emperyalîst şikandibûn; rêxistinên sivîl yên civakî ku tenê bi hin reformên civakî di lêgerîna wechekî civakî bidin kapîtalîzma dirinde de ne; forûmên civakî û nîhayet tevgera kominîst ya dinyayê ku li dijî kapîtalîzmê, bi alternatîfa ji nû ve sosyalîzmê, têkoşînê geş dike…

Ji van hemû dînamîkan heryek ji alî perspektîfa xwe ve, dixwazin têkvexwarinê tevlî dîroka ji nû ve li layenê digere, bikin. Hawirparêz,

xwecîhvan, reformvan, ji alîgirîya antî-kapîtalîst; heta bi yên ku dewletnetewê weke qurbana kûrewîbûnê dibînin yên antî-kapîtalîst û ya paşîn heta ku kominîstên dixwazin kapîtalîzmê ji bingeh ve biborin, tekoşînek ku ciyawaziyên dewlemend têkvedixwun ya antî-kapîtalîst geş dibe. Mexdûrên sazûmana kapîtalîst, karkerên ku tên mêjtin, bêkar, bindest, jin ango kirdeyên rasteqînî, girseyên fireh yên gel yê dîroka ku ji nû ve li layenê digere, li kapîtalîzmê gef xwarin wêdetir, wekî aktorên siyasî, ji bona borandina wê, ji bo ji nû ve cîh girtinê, xwe amade dikin. Ku mirovahî ji kansera civakî ku jê re kapîtalîzm tê gotin, dê rizgar bibe; dînamîkên bingehîn yên vê tekoşînê, bi gişt yên dixebitin, bi taybetî jî xebatkarên bimûçe, divê bi heşê şoreşger û navgînên şoreşger ve hevûdin dîtinê pêk bînin.

Stratejiyên emperyalîst, bi taybetî îdeolojiyên burjûvazî, di van salên paşî de; "tûşîhevbûnên navbera şaristaniyan?, "paşiya dîrokê", "paşiya îdeolojiyan" û tez an îdeayên "împeretoriyê" pêş ve ajotin. Hêna ev tez an jî îdîayên ku di welîdînê de ruxiyane, di armanca şewişandina heş û hedefê de ne. Di tevereya neteweperwerî û ol de dixwazin gel û civak di qirika hev kevin, şerên çînan yên antî-emperyalîst, antî-kapîtalîst, armanc dikin ku binsî bikin, biçewisînin. Tevgera kominîst ya dinyayê, li hemberî vê êrîşa îdeolojîk ya pirlayen, divê gelan, girseyên tên mêjtin, çewisîn, bi îdeolojî û siyaseta şoreşger ve bikokîne û divê biheşkirinê geş bike.

Di hedefa veguherîna şoreşger de, bi qanda rexnekirin û têgihîştin, bişkaftina îqtîdarê, heşê serdestan, serdestiya heş ya îdeolojiyê, bişkaftina heşê bindestan jî jêneger dibe. Her pêvajoyek kedê û heşê her kedkarî ji ber xwe ve nabe şoreşger; berjewendiyên rojane, berxwedana ji bo berjewendiyên fîîlî, nayê wateya ku ji bo heşê berxwedêran ji yê serdestan diqete. Di vê wateyê de tevazuh kirina korelasyona di navbera bona heşê mirov û xeyala azadiya mirov de, pirsgirêkek ku nebe nabe, ye. Ev, di heman demê de diyalektîka heşê mirov bûn û heşê çînê ye. Divê fehma ku tenê ku mirov wekî regezek gerîneka abaorî dibîne, fehma ku pêwendiya mirov ya di pêvajoya hilberînê de wekî diyarkerê hemû girêyên din û aîdîyetan dibîne, were borandin;ev heş û vîn pêwist e bi hemû navgînên tekoşînê ji bo girseyên karker û kedkaran re bête birin. Em bi veguhestinek heş û di nav şer de honandinek ku girê, pêwendî û aîdîyetên netewî, olî, malbatî, xwecîhî û civakî gav bi gav biborîne; aîdîyeta çînî û wekî guncantir aîdîyeta biratiya kedkariyê derxe pêş ve rû birû ne. Şertê serkeftinê

yê yekemîn geşkirina vê haveynkirina heş ya şoreşger e. Şertê serkeftina dînamîka şoreşger ya sedsala 21. yek din jî, bêyî carandina sedsala 20., li dijî sazûmana emperyalîst-kapîtalîst, tekoşîna enternasyonal ya dînamîkên kominîst, şoreşger, pêşverû yên Rojava-Rojhilat, di senteza tewereyek nû de bête geşkirin e. Rojhilat, li hemberî Rojava bêyî ku xwe bigre û derve bike, divê yekîtiya şer ji nû ve armanc bike. Şoreşa Îlonê, li dijî îdeaya "Sosyalîzm tenê kare li welatên kapîtalîst yê li pêş ava bibe", şoreş bi taybetî ji ragihandina giraniya navenda şoreşên siyasî bo Rojhilat re navendîtiya Awrûpa ruxand, gava ku navendîtiya Rojhilat borand, rol û dînamîka Rojhilat ya di şoreşa dinyayê de kêm nexist an jî bêyî ku prîm bide dijberîya Rojhilat-Rojava, pêk anî. Lenîn, bi Şoreşa İlonê re gava ku navendîtiya Rojava borand, berî neda siyaset û îdeolojiyek ku navendîtiya Rojhilat biafirîne û Rojhilat bipîrozîne. Dijê vê bi destên dînamîkên şoreşger yên Rojhilat û Rojava girt û kêlûnbûna wan armanc kir. Ev nêzîkahiya Lenîn, ji bo me kominîstên Kurdistanê ku em perspektîfa ji xwecihî gerdûnîbûnê bingeh digrin re, îro jî roniyê dide.

PARTÎYA KOMİNÎST YA DİNYAYÊ

Di dema Marks-Engels de giraniya navendiya enternasyonala Kominîst (Partiya Kominîst ya Dinyayê) Awrûpa bû, dikare bête gotin ku enternasyonala kominîst bi navendiya Awrûpa welidî û teşe girt. Ligel Şoreşa Îlonê û YKSS re, giraniya navendî ya enternasyonala Kominîst derbasî Rûsya bû. Partiya Kominîst ya Çînê di serokatiya Mao de, di pêvajoyê de berî da afirandina navendek cuda; qismen akam kiribe jî heqîqeta enternasyonala sêyemîn ya bi navenda PKYS, bi temamî neborand. Çalakiya enternasyonala IV. ya Troçkîst, lêgera navenda cuda bû; û wekî din jî bêtirîn xwedî tevna navendî ya Awrûpayê bû. Li Amerîkaya Latîn, bi taybetî di serê salên 1960 an de tecrûbeyek xwerû ya ku li dijî enternasyonala navend ya Troçkîst, PKÇ, PKYS hat jîyîn, di salên pey re, herçend partiyên kominîst yên li vê parzemînê, berê xwe dabin enternasyonala III. ya di bin akama PKYS jî helwesta xwe ya xwerû parast.

Doza kominîzmê, tenê ne pirsgirêka karkeran e, bi karker, kedkaran, bi giştî gel, ya gelan e. Weke din serê salên du hezaran de gava li dinyayê bête nêrîn, êdî, ligel kapîtalîzmê, hebûna çîna karker ya li hemû parzemînan bûye rastiyek. Ji ber vê, hebûna partiyên kominîst, êdî tenê, ne rastiya

Awrûpaya Rojhilat an jî ya Bakurî ye, rastiya her enternasyonalek li dinyayê ye. Wekî hilberîna tevgera kominîst ya sedsala 20. hevdanek girtirîn pêk hat. dî tevgera kominîst, bi qanda ku pêwistî bi xwedî tecrûbe, partiyek komuminîst ya birayê mezin nebîne, bi hevdanek dewlemend re rû birû ye. şûna têkiliyên partiyên "kak, ku pêşnyaran bikin û bi destên partiyên ciwan an jî biçûk bigirin, divê têkiliyên enternasyonalî yên spartî yekîtiya çalakiyan û guhertina tecrûbe, dîtinên dewlemend yên birayên wekhev, lê belê bi rastî jî wekhev, bête danîn.

Di serê sedsala 21. de bi navenda partiya kominîst X an jî Y, enternasyonala kominîst nayê ava kirin, ku ava bibe jî nikare bibe karîkatorê enternasyonala ÎÎÎ. ya rabidû jî. Partiyên kominîst yên roja me, fikren ango wekî îdeolojîk teorîk cîhanî, gerdûnî lê belê wekî nuxteya rabûnê li ser zemîna xwecihî-welatî-herêmî, ji nû ve divê werin ava kirin. Bi vî awayî, li şûna navenda ku ji alî partiya x, y an jî ji alî tevgera kominîst ya li erdnîgarya x, y ve hatiye ava kirin û enternasyonala ku li dora vê navendê hatibe teşekirin û partiyên ku tenê seksiyonên wê yên jêr in, divê partiyek kominîst ya dinyayê ji nû ve bête armanc kirin da ku herkes herkê bidiyê û karibe weke parçeyek wê ya organîk tevbigere.

Wekî encam, ji ber hevdana têkiliyên kişwerê yên îdeolojîk, siyasî, çandî û aborî ku enternasyonalên I., II. û III. li ser van teşe girtiye mezin bûne, em wan rexne nakin, fam dikin; têdigihên lê di şertên guherî de em bawer dikin ji nû ve û bi heman awayî dê neyên carandin.

Wekî Tevgera kominîst ya Kurdistan; ji bo afirandina enternasyonalek nû, em tevgera kominîst ya dinyayê gazî têkoşînê dikin, jo bo hewl û têkoşînên di vê derbarê de werin hevparkirin û bi taybetî her partiyek an hêzek kominîst li erdnîgar û herêma xwecîh ku lê nişstecîh e, di vê layenê de gavên pratîk yên daringî bavêjin û rengên xwe ragihînin Partiya Kominîst ya Dinyayê. Ewqas ku, em di zemîna Marksîzmê de çem û robarên xwe yên cihkî (ciyawaziyên xwe) ragihînin okyanûsa partiya kominîst ya dinyayê û yekîtiya organîk armanc bikin.

Bi rêjeya ku ev armanc pêk were, ji nû ve ji bo Marksîzmê hem tevlêbûnek afrîner bête geş kirin hem jî di gihîştina sentezekê de rê were stantin. Ancax wê demê dê hem parzeyek Rojhilat ya cidî li Marksîzmê bête dan hem jî li şûna ku Lenînîzm û Şoreşa Îlonê ku di senteza Rojhilat û Rojava de gavek mezin e, bête carandin, dê ji nû ve hilberandin û na-

vendîtiya Awrûpa wekî paşîn dê bête ruxandin. Bi rêjeya ku di vî derbarî de serkeftin pêk were, dê karibe, ji bo doza Marksîzmê û kominîzmê ji okyanûsa (senteza) mezin re xwecîhî, herêmî, parzemînî ku pêşengên mîna Che, Mao, Troçky, R. Luxsemburg, Gramscî di nav de bûn, dê karibe were raguhestin. Mîna ku hinek ji vê, hinek ji wê ku ji yekîtiya eklektîk an jî hevdanek arîtmetîk wêdetir, dê karibe bigihîje sentezeke (yekîtiyek organîk) din.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan, di rîya ku dere Partiya Kominîst ya Dinyayê de, li her çar perçeyên Kurdistanê ji bo yekîtiya tevgera Kominîst her gavek bête avêtin, bawer dike ku dê di rîya hevkarî û yekîtiya Tevgera Kominîstên Rojhilata Navîn de, dê hewlek be.

Em wekî Tevgera Kominîst ya Kurdistan; ji nû ve di afirandina Marksîzm-Lenînîzmê de, bi şirovekirina Hindî, İtalî, Amerîka Latînî, Tirkî, Erebî re di nava hevakam û têkilî de şirovekirina Kurdî / Kurdistanî, di serî de bi vê danezanê em armanc dikin. Ev, senteza ku di qada dinyayê de tê armanc kirin ji erdnîgara Kurdistanê tevlêbûnek xwerû ye.

Wekî Tevgera Kominîst ya Kurdistan, girêdayî vê pirsgirêkê; em bang dikin ku Lenîn çawa nêzîkahî li Marx / Marxîzmê kiriye, Tevgera Kominîst ya Dinyayê jî divê wisa nêzî Lenîn / Lenînîzmê bibe.

Di ser Şoreşa Îlonê û mirina Lenîn re nêzî sed sal dem derbas nû. Piştî Lenîn, bi taybetî di nîvê duwemîn yê sedsala 20. de çi geş bûn-stewîn? Ku ewana bi kûrahî neyên analîzkirin, bi heman carandina Şoreşa Îlonê û Lenîn re, nêzîkahiya doxmatîk ya li Marksîzm-Lenînîzmê, nayê borîn. Ma, hîç tevlêbûnek afrîner li Marksîzm-Lenînîzmê nebû, bû. Lêgerînên Che û yên hevalên wî yên xwerû yên li Amerîka Latînî, xwerûtiya ku Mao di şoreşa Çînê de pêk anî, felsefa Siyasetê ya ku Gramscî ya xwerû ku ji bo civaka navend bajêr geş kir hwd. tê zanîn. Ji alî beşdaran ve dikare mînak bêtin zêdekirin; lê belê heqîqeta borîn û borandina hin beşdaran jî heye; hem jî ji beşdarên xwecîhî wêdetir, di serî de di derbarê teorîya rêxistin / rêxistinbûnê de beşdarên gerdûnî wekî diviyahî xwe didin pêş.

Lenîn dehayek siyasetê yê heqîqî bû. Di nêrîna rabirdû û dahatû de, qetandin û timdomiyê wekî parçeyên bitûniyê xistibû dest û bi bitûnî jiyabû. Lenîn gava ku ji enternasyonala II. rîya xwe cihê kir, qetandin rojane kir û bi hilberînek ji nû ve, bû pira qetandin û timdomiyê. Tevgera Kominîst ya Dinyayê, li serî di sedsala 21. de; divê, bi hêza xwe ya diyarker ve

tevgera Kominîst ya sedsala 20. ku veguhezî tevgerek demokrat ya civakî re, rîya xwe cihê bike û qetandinê pêk bîne û Marksîzmê bingeh bigre û jê re, ji nû ve beşdarîya hilberîner û timdomiyê, pêk bîne. An emê pêk bînin û piştçiyê ango xetên diyar yên sosyalîzma sedsala 21. ji civakê re net, jê famker, bi tarîfek qanekirî û bi giyanekî şoreşger pêşkêş bikin an jî buhrana kapîtalîzmê ku veguhêziye buhrana şaristaniya senanyiyê, dê ligel xwe, mirovahiyê jî berbi tunebûnê ve bikşîne.

Rêxistinbûna kominîst ya sedsala 20. di çapa dinyayê de bû dînamîka guherînên şoreşger. Lê belê, di serî de partiya Lenîn PKYS, rejimên sosyalîst ku heman partî û rêxistinan di afirandina wan de rolek diyarker lîstibû, di pêvajoyê de, bi avahiyên xwe; bîrokratîk bûn, mat bûn û veguherîn avahiyên ku xwe dicarînin, îdeaya xwe winda kirin, çilmisîn û ruxiyan.

Taybetiyek rêxistinên kominîst yên sedsala 20. ku derket pêş jî ev bû; di pêvajoyê de kêm zêde di hemû partiyên kominîst de navend bû Xweda, sekreterê giştî derket qata pêxemberiyê. Ligel hin faktorên din, vêya ji alî avahiya hişk ya navendîtî ve hat afirandin. Ev taybetiya ku bi armanca siyasî, îdeolojî, felsefeya kominîst ve ne li hev bû, nehat borîn.

Di rêxistina Kominîst ya sedsala 20. de hevsenga disîplîn û azadiyê, di nav disîplînê de li ser azadiyê hatibû avakirin. Her tişt ji bo mirov û azadiya mirov hatibû pêkanîn; lê belê di nav sînorên disîplîna rejimên sosyalîst û partiya wê de, azadî qada jîyînê nedît û di pêvajoyê de xeniqî. Bêtirîn disîplîna ku azadî xeniqand jî ji ber ku bê oksîjen ma, ji ber xwe ve ruxiya. Di heqîqetê de jî partî û dewletên sosyalîst yên ku bi disîplînek pola hatibûn honandin ligel artêşa dêw, tora îstixbaratê ya leşkerî û sivîl, ev rejim ji ber xwe ve ruxiyan. Di ruxandinê de ligel hin faktorên din, rola disîplîna ku derveyî bû ya di tevna rêxistinê de jî heye.

Geşedanek hevşib, di xebitîna navendî ya demokratîk ku îro jî di xebitîna rêxistinê de regezek jêneger e, hat jîyîn. Hevsenga demokrasî û navendîtiyê ji ber ku bi bingeh girtina navendîtiyê damezrîbû; demokrasî, di pêkanîna qada jîyînê de ket zorê û di nav tevna rêxistinê de tim biçûk bû.

Tevgera Kominîst ya sedsala 20. û bi taybetî partiya Lenîn, di serî de li rû dinyayê rêxistina herî demokratîk ya dinyayê bû. Partiyên kominîst, bi gotinên "emê bîrokratîk bibin, emê navendîtiyê derxin qata Xwedê, li şûna îqtîdara gel emê ya partiyê damezrînin" hwd. bi rê neketin, lê di pêvajoyê de wiha bûn! Çima? Tevgera Kominîst ya Dinyayê ya divê pratîk û te-

orîya rêxistinbûna sedsala 20. bidarizîne û bersîva wê hilberîne.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan; di serî de modela rêxistinê ya Lenînîst, rêxistina kominîst ya sedsala 20. fam dike-têdigihîje, lê belê di şertên têne guhertin yên welêt û dinyayê yên ku geşbûne-guherîne-stewiyane de, diyar dike ku pêwistiyê bi carandina wê nabîne. Gazî Tevgera Kominîst ya dinyayê dike ku di serî de rêxistina Lenînîst, ji bo ji nû ve bi tevlêbûnek afrîner teorîya kominîst, bête hilberîn. Hîn di şênberiyê de; ne îqtîdara partiyê, ya gel; di xebitîna partiyê de jî têgiha yekser demokrasî û ji qadroyan wêdetir xebîtîna avahiyê; li şûna ku merkez ji jor ber bi jêr ve xwecîh bibe, navendîbûna xwecihê; li şûna azadiya di nav disîplînê de, di nav azadiyê de disîplînê û wekî yekîtiya van ya orxanîk ya ne li navendê, li gewdeyê modela gerdûnî rêxistin / rêxistinbûna bi hêz biafirînin, em bi van vatiniyan ve rû bi rû ne.

Lîstika "demokrasî, azadî" ya ku emperyalîzm û sermaye di van salên dawî de bêtirîn serî lê dide ku bête xerakirin; li dijî êrîşên zêdebûyî yên emperyalîzm û sermayeyê, pêwistî ji rêxistinek dînamîk û navendek bihêz re, ji rabidûyê bêtir diviyahî tê dîtin. Navendek bi hêz, lê belê ku vê hêzê di gewdê xwe de sift dike an jî navendek hêza xwe ji wir digre; bihêz lê belê mîna centera Îngilîzî navend ya kurdî ku navendek bihêz î gewde an jî navê temsîl bike; di partiyê de kombûn û hêza siyasî, felsefîk, îdeolojîk ne tenê li navendê, rêxistinek ku karibe bi esasî li gewdê rêxistinê kom bike! Bi qanda raberî despotiya navendê, sitemkarîya xwecîhî jî karibe bibe bariyer, di gewdê de rêxistinek bi hêz ya kominîst, bêtirîn rêxistina ku nikaribe afrînerên rêxistinê (ango rêxistinkarên xwe) birêxistin bike û hêsîr bigre û karibe timdomî xwe biborîne!

Ku rêxistin, ji hêlekê ve vîna şoreşger û disîplîn be, berevajî rêxistinbûna kominîst ya sedsala 20. ku di nav disîplînê de azadî bingeh digirt, tevgera kominîst ya sedsala 21. di nav azadiyê de disîplînê bingeh digre; bi vê yekê disîplînê di xebitîna rêxistinê û avahiya qadroyan de hundirandî û bixe rewşa tevnê ku disîplînê ji regezek derveyî derbixe, karibe derbixe; navenda ku hat damezrandin, berevajî ceribandina sedsala 20, ku ji jor ber jêr ve birêxistin dibû û paşê xwecihî dibû, xwecihî ji her alî ve gav bi gav ber bi navendê ve mezin bibe (navendî bibe) û li navendê yekîtiya organîk pêk bîne, ev rêxistina kominîst! Ev rêxistin, bi xêzên xwe yên sereke di nav bitûniyekê de, di gewdeyê de rêxistinek bihêz e.

Dİ GUHERÎN-VEGUHERÎNA GELAN/CİVAKAN DE FONKSÎYONA PÎŞE Û WÊJEYÊ

Çand, têgehek gelek fireh e û hemû jîyana mirov ya daringî û derûnî diguncîne. Ji çanda mîmarî heta lixwekirinê, xwarin, gihandina hilberê, ji çanda olî heta siyasetê temamê jîyanê têkveduxwe. Ku çanda siyasetê li der bête hiştin, di qadên çandê yên din de yekser an jî tazî berîpêdana îdeolojiyê nabe. Lê belê neyekser be jî qadek çandê ku têkvexwarinek wê ya felsefî, îdeolojîk nînbe, tune ye

Kesên dibêjin "peyamek îdeolojîk ya pîşe-wêjeyê nîne" di nav çewtiyê de ne. Di dîrokê de hemû hunermend / hunermendên mezin; ji ber ku di şertên ku di nav şer û nakokiyên nav çînan yên kûrbûyî, şerê aborî, civakî, siyasî yên tundbûyî, yên dîrokî û civakî de tevgerîyan û bûne alî, bûne pîşevan, wêjevanên mezin. Gorkî, Tolstoy, V. Hugo, Neruda, Pîcasso,

Cegerxwîn, Nazim, Ruhî Su, Yilmaz Guney hwd. Piraniya van hunermendan di heman pêvajoyê de (Gorkî, Pîcasso, Nazim, Cegexwîn) karbidestên partiya kominîst ji ber vê jî di siyaseta wê de çalakvan an jî neferên wê bûn. Hemû hunermendên lîberal, neteweperwer an jî kominîst bi navgîna wêjeyê peyamên xwe yên îdeolojîk, siyasî ragihandine gel. Bi hunera xwe propaxandaya şoreşger germ kirine, rengên wê biriqandine û ragihandine gel.

Pîşe, wêjeyek ku bi temamî ji têkvexwarinek îdeolojîk, siyasî bêpar nîne, nabe. Kesên ku dibêjin bi hunerê, ji ragihandina peyama îdeolojîk, siyasî "na" û raber derdikevin; di xizmeta sermayê û rejimên wê de helwestek îdeolojîk radixînin û bêîdeolojîbûnê diparêzin. Kesên ku ji hunera civakî dûr ketine, ji rejimên sosyalîst yên kevn re, ji lîderên wê re û bi giştî êrîşî nirxên sosyalîst dikin û bi gotina "binêrin em çawa wana rexne dikin" re peyamê didin sermayê û rejimên wê.

Di serî de şoreşa burjuva ya Fransiz ya 1789 û Şoreşa Îlonê ya Sosyalîst ya 1917 an, di hemû şoreşên sereke de; pîşe-wêje, felsefe û siyaset raberhev, akam li hevûdin kirine û heta bi hevûdin xwedî kirinê geş bûne. Ango ji hev neqetandî ne, hevderbasbûyî ne. Ronesans-reform-humanîzma ku ji sedsala 14. pê ve geş bûye û ronîbûna sedsala 18. ya paşî şoreşa burjuva a 1789…Ango şoreşa 1789 ya burjuva, bi zembîlê ji asîmanan daneket. Ku fonksiyona di pîşe, wêje û felsefe, di amade kirina guherîn-

veguherîna gel û civakan bi bêhnfirehî nebûna; şoreşên siyasî, civakî ku di guherîn-veguherînê de vîraja tîj temsîl dike, dê pêk nehata. Ger ronîbûyîna sedsala 18., ger di salên dirêj de felsefeya wêje, pîşeya anarşîst, humanîst, şoreşger ya Rûs ku ji bo guherînê gel amadekirina, fonksiyona xwe nekiribûna piştek, Şoreşa Îlonê ya sala 1917 pêk nedihat.

Di amadekirina gelan, civakan ya dûvûdirêj de fonksiyona pîşe-wêjeyê diyarker e, bi vegotinek din ji disîplîna siyasetê bi akamtir e; lê di şoreşguherîna civakî-siyasî ya radîkal de ku vîraja tîj temsîl dike, fonksiyona siyasetê diyarker e. Pîşe, wêje û siyaset ligel ku hevderbaskar in û fonksiyonên wan î wiha yên xwerû jî hene.

Di dîrokê de têkiliya siyasetê û rewşenbîr tim bûye pirsgirêk. Ev pirsgirêk ji kesan bêtir, ji tevna xwe û ya siyaset û pîşeyê tê. Wekî dînamîka pîşe-wêjeyê rewşenbîr, ger ji ber pêwistiya qadên wan yên xwerû û ger ji ber avahiya xwe ya mubtelayê azadiyê û çi ji ber disîplîn û sînorkirina ku ji avahiya siyasetê tê û pirsgirêkên din… Bi berçavka siyasetê ji hilberîna rewşenbîran re sînordanîn, hela li ser navê partiyê hilberîna pîşeyî-wêjeyî reçete pêşkêşî kirin, dê qada hilberînê ya xweser ya rewşenbîr teng bike û ev nêzîkahî çewt e. Berevacî vê, divê siyaset jî li hember hilberîna hunermend, xwedî azadiya ku karibe bêje rast e an çewt e.

Ravekirina rewşenbîr zor e. Xwende, bijîjkê bi destûrname, parêzer heta bûyîna bi bernavê profesorî û rewşenbîrbûnî tiştên ji hev cuda ne. Kirpandina rewşenbîrbûn mirovê şer bûnê ye jî têr nake. Bi bernavên akademîsyen, profesor mirovê zanistê ku di xizmeta Hîtler, Musolînî, Kenan Evren, Bush, Ehmedînejad de şer kirine gelek in. Ji vanan re, gotina rewşenbîrên burjuvazî jî bi pirsgirêk e. Hebe nebe vana reşenbîrên kevneperst in. Ku ji vanan re rewşenbîr bête gotin ji Tolstoy, Neruda, Nazim, Cegerxwîn hwd. ku li lehengên bêhêjmar yên di vê qadê de, dê neheqî bête kirin. Emê neheqiyê li Feqiyê Teyran jî bikin ku ew hê di sedsala 14. de digot:

Ez dengbêj im hatim vira
Heta hebin dengê mîra
Ezê binivîsim ser kaxeda
Ne diçim dêra ne mizgefta.

Di rewşek dîrokî de ku zanîngeh bere bere dibin marketên mezintirîn, mirovên zanistê bere bere dibin karmendên firotina agahiyê, afrînera di

warê pîşe û wêjeyê de dibe parçeyek ji çanda xeridandinê û bihûdek bazirganî qezenc kiriye; berhemên ku sponsorîya mezringehên çandê yên grûbên sermayê yên mezin ku nestînin, nikarin xwe ragihînin gel û di civakê de dînamîkên pîşe-wêje yên pêşverû, şoreşger, civakî şerê jîyînê didin.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan, di van mercan de dînamîkên pîşeyê û herkesê ku di vê qadê de bi hestên berpirsiyar tevdigerin:

Li dijî dorpêçkirina pîşe-wêjeya spartî sponsorîya grûbên sermayê û pîşeya ku bi patenta dewletê, helwestê nîşan bidin,

Nêrîna "pîşe bo pîşe" bête redkirin û bo pîşeyê ji nû ve parzeyek pêşverû, şoreşger bête pêkanîn,

Ji bo di pîşe-wêjeyê de spartî senteza romantîzma şoreşger heş û hest, ferisandina rexneyî û hêza xeyalê, ji nû ve bête geş kirin,

Bi qanda ku li dijî rejimê, li dijî sazûmana mêtinger ya kapîtalîst jî nav li karker, xort, jinên kedkar û gundiyan, bête dayîn, ji dirûşman wêdetir vê nav têdanê ji bo bi naverokek pîşeyî û ji kûr ve di pîşeya civakî de bête xebitîn, xebat bête dayîn,

Li şûna ku hilberîna xwe di jiyana jîndar de pêk bîne, li dijî wêjeya postmodern ku spartî "talan kirina arşîvan" e helwest bête nîşandan, ji bo geş kirin û bihêzkirina nifşa rewşenbîr ya ku bi karker û kedkaran re çarenûsa xwe kiriye yek,

Di rewşa Kurdistanê de ji bo, di rîya ku Baba Tahir, F. Teyran, E. Xanî, Qedrîcan, Y. Guney û Cegerxwîn vekirine de bête meşîn, ji bo îdealên wan yên azadiya netewî û sosyalîzmê bi têkvexwarinek hemdem di pîşe, wêjeyê de ji nû ve bête hundirandin GAZİ DÎKE.

MEZOPOTAMYA, ŞARİSTANİYA ROJHİLAT-ROJAVA Û LÊGERÎNA SENTEZEK NÛ

Dergûşa çanda dinyayê û xaka baweriyên Xwedayî yên pêşîn, lê serî rakirine, bigiştî Rojhilata Mezin, bi taybetî "Hîlala berdar" e. Bikaranîna xakê, gavên hilberîna çandiniyê yên pêşîn ji alî gelê Mezopotamya, wekî guncantirîn gelên Rojhilat in. Mezopotamya "Hîlala Berdar" dergûşa şaristaniyê ya dinyayê ya pêşîn e, erdnîgara ku zanist û çandê pêşîn lê aj daye ye.

Xeleka yekemîn ya meşa şaristaniyê ya mirovahiyê, Mezopotamya-Mi-

sira kevnar; gavek ji par î wê xeleka duyemîn Hind-Çîn û Maya-Aztek a antîk; û xeleka sêyemîn jî Yunan-Roma temsîl dike. Derketina ber ronahiyê ya şaristaniya Yunan-Roma ya kevnar, piştî şaristaniya Mezopotamya-Misir ya kevnar e. Ku bi nêrînek din bête nêrîn; **şaristaniya mak** Mezopotamya-Misir; **şaristaniya Rojhilata Mezin û şaristaniya Başûrî**, Mezopotamya-Misir, Hind-Çîn, Maya-Aztek; **şaristaniya Rojava ya kevnar jî** Grek-Roma nîşan dike. Hem şaristaniya Rojhilata Mezin / Başûrî û hem jî ya Rojava berê ji Mezopotamya-Misrê akamê digre, jê xwedî dibe, paşê jî di gava duwemîn de li hev akam kirine û ava bûne. Hewza Dîcle-Firat û hewza Deryaspî ku Nîl diherkiyê, di dîrokê de di navbera gelan / civakan de ji bo çand û sentezê bûye mîhraqên hevpar yên girîng. Di dîrokê de Mezopotamya û Misir bi ajên pêşîn yên çand û zanistê ve; Yunan, bi xebata felsefe û zanist ya pêşîn ve; Roma, bêtirîn bi pîşeya şer, dad û endezyarî têne bibîranîn. Rojavaya nûjen û bi giştî şaristaniya senayî ya kapîtalîst tiştê ku bi esasî lê digerîya, li Romayê dît. Û navendbûyîna Rojava ya şaristaniya senayiyê û disîplîna modernîst jî ligel faktorên din, ji vir tên. Jixwe çi hatiye serê mirov; yekemîn bi derbasbûna milkiyeta arzî, duyemîn jî ji ber ku endezyarîya Romayê bûye disîplîna sereke.

Çand û şaristanî, di dîrokê de hevderbas in, ketine nav hev. Ku bête nêrîn, yek jê jî ne homojen in, ne safî ne, tevna giştan ya resen ji derbasbûnên hevraber ciyawaz bûne, ji yek pareyiyê derketine û dureh bûne. Gava pêşîn ya vê derbasbûnê an jî sentezbûnê; berêpêşîn di navbera Mezopotamya-Misir de û ji şopandinek ji par re di navbera Mezopotamya-Misir-Enetolya-Hind-Çîn (ango Rojhilata Mezin) pêk hatiye, bi derbasbûnên hevraber ve akam li hev kirine, hev ava kirine û geş bûne.

Sentezbûyina mezin ya pêşîn ya dîrokê di navbera felsefeya Yunan-Roma ya klasîk û zanist û çanda Mezopotamya-Misir (ango Rojhilat û Rojava) de, bi qederek şûn de pêk hatiye. Ev gav, wekî bi giştî hevdîtina pêşîn ya cidî ya di navbera çanda Rojhilat û felsefeya Rojava de ye. Di vê hedîtinê de, zemîna mader bi taybetî Mezopotamya-Misir, bi giştî jî ji şaristaniya Rojhilat ya mezin pêk tê. Şaristaniya Yunan-Roma ya antîk ku jê xwedî bû û li ser bilind bû şaristaniya Rojhilat ya mezin e. Disîplîna dîrokê ya navend Awrûpa, ligel ku Yunan-Roma ya kevnar derdixe pêş, Mezopotamya kevnar, Misir û Rojhilatê Mezin jî bi sîstem paşguh dike.

Êdî Awrûpa û Asya (bi taybetî jî Rojhilata Navîn) ango; li Mezopotama-

Pers-Komagene-Misir-Enetolya-Yunan-Romayê çand, zanist û felsefe hevderbas e û bi têketinên hevraber ve hevûdin temam kirine û ava kirine. Di nav şaristaniya Yunan de şaristaniya Mezopotamya-Pers de şaristaniya Yunan; di nav şaristaniya Romayê de şaristaniya Misir, Enetolya; di nav şaristaniya Misir-Enetolyayê de jî şaristaniya Romayê heye. Wekî guncantirîn di qada çand, zanist, felsefeyê de Rojava, Rojhilatê; Rojhilat jî Rojavayê têkveduxwe. Çand û şaristanî, di dîrokê de tim hevderbas bûne. Wekî împeretorîya Romayê ku nimûneyek xwerû ye, li Asyayê bûye Rojhilatî. Ol jî li dervayî vê hevderbasbûnê nemaye.

Wekî sê olên semawî yên mezin; Mûsewîtî, İsewîtî, İslamiyet jî li "Hîlala Berdar" welidîn, geş bûn û wekî dewama havûdin derbasî nav hev bûn û hersê jî ji Zerdeştiyê xwedî bûn ku ew pêşîn derbasbûna yek Xwedayiyê temsîl dike.

Ciyawazî an jî dijberîya Rojhilat-Rojava; milkiyeta arzî, çîn, mêjtin, wekwekî navgîna çewsandinê dewlet û ji ber vê, siyaset gava derket ser dika dîrokê, paralelî vê bi zanebûn hatine geş kirin. Hêna jî tên geş kirin.

Wekî kevirê kîlometreyê yê diyar, di dîrokê de dijberîya Rojhilat-Rojava; bi şerên Med (Yunan-Pers), ciyawaziya Xiristiyan-İslamê, ruxîna împeretorîya Romayê û qedana serdema navîn, mêtingehkarîya ku Rojava geş kir û paşîn jî bi armanca mêjtin û serdestiyê ku Rojavaya emperyalîst-kapîtalîst bi Rojhilat kir "yê din" re gihîşt nişûvê.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan: binî xêz dike ku di serê sedsala 21. de dîrok û şaristanî ji nû ve di nav lêgerîna layenê de ye û dînamîkên ku alîgirên guherîna şoreşger in, gazî li wan dike ku tekoşîna ku têkvexwarine ji nû ve tevlî dîrok û şaristaniyê bikin, bidin. Fikra ku şaristaniyên Rojhilat-Rojava "dijber in" û îdeaya "şerê navbera şaristaniyan" ku pirsgirêka şaristaniyan wekî hilberîna heşê dîrokê yê şewş û hilberîna propaxandaya xapînok ku bi navend girtina Awrûpa ve teşe girtiye, dibîne û red dike, diyar dike ku şerê eslî şerê di navbera kapîtalîzm û mirovahiyê de ye. İdeaya qelemşorên emperyalîzmê yên îro ku dibêjin "şaristanî şer dikin û tu caran dê li hev neyên" diyar dike ku bi armanca, bi gişti Rojhilat, bi taybetî civakên İslamê ji nû ve "yê din" kirin re, ji bo şaşkirina hedefa tekoşîna navbera çînan (serdest-bindest) ku di serê sedsala 21. de bi kûrahî ji nû ve haveyn digre re, tê kirin. Û vê hedef şewişandinê ku regeza wê ya mader navendîtiya Rojava (daringîtî, kestî, nîjada spî û xiristiyanî) bi hemû la-

yenên wê ve red dike, li nik girseyan teşhîr dike û ya ku wekî alternatîf dertê pêş, dîtina Rojhilatîyî, Asyatî, İslamiyetî jî red dike

Zihniyeta dagirker, mêtingehkar, wekî tiştekî tim bi çavên ku dê lê bête gerîn, dê bête çavdêrî kirin, jê bête xwedîbûn û bête mêjtin li Rojhilat (Başûr) nêrî û misyona "li Rojhilat damezrîner" li xwe bar kir. Berêpêşîn em vê red dikin. Di dîrokê de, bi taybetî wekî dîroka nêz di sedsala 20. de gelên Rojhilat û Başûr îspat kirin ku ew kirdeyên dîroka xwe ne. Di nav şerê li dijî emperyalîzmê de îspat kirin ku karin xwe damezrînin, ji nû ve xwe amade dikin ku îspat bikin. Tevgera Kominîst ya Kurdistan di tekoşîna şaristaniyek nû de, binê rola gelên / civakên Rojhilat û Rojava bi hevdanên hevraber, xêz dike, di vê layenê de gazî tekoşînê dike.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan; bawer dike ku, ligel şaristaniya senayî ya kapitalîst, dê karibe navendîtiya Rojava jî were borîn ji gelek layenan ve û bi borînên azad re, dê karibe sentezek nû bête bidest xistin û ev senteza nû bi şaristaniya mader re di aştiyê de kare pêk were û senteza Rojhilat-Rojava kare geş bibe. Diyar dike ku rîya dere senteza nû, bi Şoreşên Îlonê yên rê li ber sosyalîzmê veke, dê karibe pêk were û di vê pêvajoyê de bi şaristaniya kominîst ya çand serdest dê karibe kûr bibe.

Kurd (mîna Ermenî, Ereb, Eşûran) ji gelên xwecîh yên Mezopotamya ye. Gelê Kurd û di pêvajoya afirîna Gelê Kurd de gelên ku hevraber akam li hev kirine, dînamîkek afrîner yê şaristaniya Mezopotamya ye. Bi taybetî Hurî; bi sedema xebitîna pira çandê, di dîrokê de xwedî cihekî girîng e. Di ragihandina çanda Mezopotamya bo civakên Hitît, Filîstîn û Fenîkîyan û ji ber vê civaka Yunan û dinya Rojava, rolek girîng lîst.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan ku reha xwe ya dîrokî li aliyekî, li welatê me digihîne demara welatperwer-kedkar-sosyalîst ku ji Feqiyê Teyran heta Cegerxwîn dirêj dibe, ji alî din ve dispêre teorîya Marksîzmê û soyalîzma zanistê, bi veguherîna şoreşger ya li dinyayê û di nav têkiliyên organîk yên pê re, li Kurdistanê guherînê armanc dike.

HERÊMA ME

Lİ KURDİSTANÊ Û Lİ ROJHİLATA NAVÎN SÎNOR, Lİ DİJÎ VÎNA GELAN HAT DİYAR KİRİN

Kurdistan bi peymana Qesra-Şêrîn, berê di navbera İran û Osmaniyan de, bû du beşan. Piştî vê dabeşbûna pêşîn ya di dîrokê de, di dû şerê parkirinê yê emperyalîst yê 1. de, bû çar beşan. Ligel Fransa û İngilîstan dewletên herêmê yên mêtingehkar / İlheqkar berpirsiyarên vê dabeşkirina duyemîn in.

Dewletên İngilîstan û Fransa yên emperyalîst ne tenê Kurdistan, bi giştî Rojhilatanavîn bi taybetî li erdnîgara Ereban, vîna gelan bi hîç hesibandin, bi temamî li gorî berjewendiyên xwe û hevsengên hêzê, sînor li ser nexşeyê, adetî bi cedwel xêz kirin. Bi vê yekê ciyawaziyên etnîkî û olî yên navbera gelan, civakan ku pêwist bê dîtin ji bo karibin weke nakokiyê bikar bînin, zemîn amade kirin. Ligel ku welatê Kurdistan bû çar parçeyan, li erdnîgara Ereban, girêdayî xwe, li dora 20 dewletên ji hevkariyê wêdetir yên kukla ava kirin. Emperyalîzmê bi vê yekê xwest ku mafê gelan yên ku

karibin dîroka xwe bixwe pêk bînin, ji dest wan girt û hêna jî di vê yekê de israr dike.

Di şerê parkirinê yê emperyalîst yê. II. de; Komara Gel ya Azerbêcan û Komara Kurd ya Mehabad bi desteka artêşa Sor hat damezrandin. Piştî kuYDA û Îngilîstanê ultîmatom dan, Artêşa Sor vekişiya û herdu Komar jî ruxiyan. Di vê ruxînê de berpirsiyarên esil emperyalîzma Îngilîstan û DYA ye. Gunehên emperyalîzmê di pirsgirêka Kurd / Kurdistanê de ne hewqas in. Di peymana 1975 ya Cezayîrê ku jo bo Gelê Kurd bedêlek giran bû û di koçberkirina 1991 ya rejima Sedam de, siyaseta ku YDA şopand, bi qanda dewletên Îraq û İranê berpirsiyar e.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan di wê baweriyê de ye ku hesab û pîlanên emperyalîzmê yên ji bo herêmê ancax, bi vîna siyasî ya yekgirtî ya gelan dê karibe were xerakirin; nexşeya siyasî-erdnîgarî ya ku dervayî vîna Gelê Kurd û bi giştî ya gelên Rojhilatanavîn, nasnake.

Yekîtiya Kurdistan û Gelê Kurd wekî mafekî dîrokî dibîne. Di navbera parçeyên Kurdistanê de, geş kirina alîkarîya siyasî ya tevgera kominîst ya tevgera demokratîk ya netewî diparêze.

Lİ SEDSALA 21. QADA ŞERÊ SERDESTÎ YÊ NAVBERA EMPERYALİSTAN PARZEMÎNA ASYA

Di navbera navendên hêzên emperyalîst de, şerê parvekirina bazarê, ji nû ve gur dibe. Qada vî şerî yê bingehîn jî bigiştî parzemîna Asya, bi taybetî Rojhilatanavîn e. Bloqa YDA-İnglîstan di sedsala 20. de, bi dustûra "yê li Asyayê serdest be, li dinyayê jî serdest e." tevdigere. Asya, ji alî çavkaniya enerjiyê ya fosîl û ji alî nifûsê ve piraniyek mezin ya dinyayê temsîl dike. Pergala emperyalîst-kapîtalîst bi girêdanek jîyanî ve bi çavkaniyên enerjî yên fosîl (petrol, xaza xwezayî hwd) ve girêdayî ye ku ew jî bigiştî li Asya, bi taybetî li Rojhilatanavîn peyda dibin; sedema ku emperyalîzma YDA ku berê Afxanistan dû re jî İraq dagir kir, ev e. Armanc ew e ku çavkaniyên enerjiyê û erdnîgara u xetên enerjiyê lê ne û tê re derbas dibin, ji nû ve bixe bin kontrolê. Armanc, Asya ku carek din hebûn û hêza xwe bi Rojava bide pejirandin, ji nû ve "bixe qalib" û kontrol bike. Armanc dorpêç kirina Rûsyayê, armanc hilberîn û xeridîna kapîtalîst, bi şerên herêmî, hevseng kirin e. Çimkî şer, ji bo emperyalzmê, di heman demê de xebitîna "projeyên mezin yên giştî" jî pêk tîne. Pergala emperyalîst-kapîta-

lîst bêyî şer nikare bijî. Kapîtalîzm bi şer welidî û pê mezin bû. Di tevn û derûna wê de şer heye. Ya paşîn armanc, bi tektîka "lêdana pêşgirî" hem şer li dûrî welatê xwe li dar bixe û hem jî rewşa şer, teror û kaosê li dinyayê jîndar bike û pê, şerê çînan yên ku ji binî tê, şerê bêmilkan yê raberî bimilkan di bin siyê de bihêle. Propaxandaya birina "demokrasî, azadî" bo Asyayayê, Rojhilata navîn jî tenê çarên siyaseta dagiriyê ye.

Bloka YDA-Îngilîstanê ku bi israr dixwazin NATO yê li Rojhilat bi cîh bikin û hewlên wan yên li Deryareş, Qefqasyaya Başûr û li Asyanavîn yên leşkerî, siyasî, aborî, gavên pêşî yên Stratejiya Avrasyayê ne. YDA van gavan dike sipartek û bi firsendîtina rewşa siyasî ya germ ku 11 İlon 2001 ê bi destxistibû, berê Afganistan, dû re İraq dagir kr. Li van welatên ku dagir kiriye, per û baskên wê neşkên, dê dora dagir kirinê were hin welatên din.

Dost û dijminê emperyalîzmê nîn in, berjewendiyên wê henê û li gora berjewendiyê dost û dijmin guherbariyê nîşan dide. Emperyalîzma YDA ne ji bo "azadiya" gelê Kurd û Ereb, ji bo berjewendiyên xwe İraq dagir kir. Venebûnên stratejiya îxrac kirina "îstîqrar", "azadî" ya bi geş kirina şer, dagir kirin û hêza tankan ku YDA li dinyayê û li İraq û Rojhilatanavîn pêk tîne, kûr dibe. Daneyên ku dê bikeve rewşa Almanya ya sedsala 20. bi hêz dibe.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan, hişyarkirina kesên ku dibêjin emperyalîzma YDA "dostê" gelê Kurd e, ji xwe re wezîfe dibîne û binî xêz dike ku bi benê YDA nayê ketin bîrê, gazî tevgera netewî ya Kurd dike ku helwestek dînamîk li dijî emperyalîzmê nîşan bide.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan, tenê bi çav û berjewendiyên gelê Kurd li Rojhilatanavîn nanêre. Berjewendiyên gelên Ereb, Fars, Azerî, Tirk, Ermen, Çerkez hwd. bi yên gelê Kurd re wekî bitûnî dibîne û diparêze.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan; bawer dike ku dînamîka demokratîk ya netewî ya Kurd, di Rojhilatanavîn potansiyelek guherînê ya mezin dihewîne. Binî xêz dike ku pêşîlêgirtina vê potansiyelê ku bibe hêza yedek ya siyaseta emperyalîzmê, berpirsiyarî û wezîfeya siyaseta pêşverû, şoreşger, kominîst yên herêmê û Kurdistanê ye. Herkesî gazî wezîfê dike ku potansiyela veguherînê ya Kurd bikin tekoşîna netewî azadî-sosyalîzm ya gelê Kurd û dînamîka şerê demokrasî-sosoyalîzm ya gelên herêmê.

‘SİYASETA BERJEWENDÎ YA NETEWÎ’ TİM DİJMİN HİLDİBERÎNE

Her netewe, heta her erdnîgara ku bi dewlet sînor lê hatiye xêz kirin, “dîroka netewî” ya xwe nivîsî û derxist pêş. Her “dîroka netewî” kêm zêde îleh nirxên çandî, siyasî, zanistî (dîrok) yên gel û neteweyên cîran, ji xwe re kirin mal û nivîsandin; hêna jî tê nivîsandin. Her “dîroka netewî” bi xwenivîsîn namîne û weke ya ku dibêje “bixwe” nede, nirxên hinên din ji xwere dike mal. Di vê xwedîderketinê de, di serî de li Rojhilatanavîn û hewza Deryaspî, di dîrokê de hevderbasa çandê, xwedî rolekê ye, ligel vê siyaseta ku “berjewendiyên netewî” ji xwe re kiriye al ya neteweperwer rolek diyarker lîstiye. Wekî guncantirîn dîrokzanên Awrûpa yên burjuvazî dîroka dinyayê bi perspektîfa navend Awrûpa nivîsandinê ve pêkanîne.

Bi siyaseta ku “berjewendiya netewî” tevere digre, ne li dinyayê ne jî li Rojhilatanavîn di leha gelan de pirsgirêk nayên çareserkirin. Ji ber ku “berjewendiya netewî” ya her dewletê, her neteweyê, di serî de yên cîran, yên dewletên an jî yên netewe / neteweyên din kêm zêde teqez têkveduxwe. Sedema bingeh ya hevgewuxandina xwînî ya di 200 salên paşîn de tê domandin ya di navbera dewlet an jî netewan de, herkes dixwaze “berjwendiya netewî” ya xwe li dijî cîranên xwe û yên din geş bike. Ev siyaseta bi tevera ?berjewendiya netewî” ne dost, dijmin hildiberîne û bi propaxandayê armanc dike ku di heşê girseyan de “dijmin” tim jîndar bihêle. Wekî şovenîzmê navendîtiya etnîk, şertê bingehîn yê nêrîna li “yê di” an jî “yê din kirin” ê yê. Berjewendiya netewî îcaba xwezaya xwe, ne dost lê hilberandina dijminî ye, ji vir tê.

Rejimên mîna İran, Tirkiye, bi boneya “berjewendiya netewî” Netewê Kurd û netewên din û kêmarên di bin dest de dihêle; tevkuştina Ermenan bi îcaba “berjewendiya netewî” pêk hat; Îngilîstan û Fransa ji bo “berjewendiyên netewî” Asya û Afrîka kirin metingeh. YDA ji bo “berjewendiyên netewî” İraq dagir kir, İran û İraq dîsa ji bo “berjewendiyên netewî” 8 salan şer kirin.

Di sedsala vê paşiyê de, wekî îcaba “siyaseta netewî” gel bi hev hatin gewuxandin. Encam: Neçareserî, di her carê de bêçareserî kûr bû. Siyaseta ku herkesî li ser bingeha “berjewendiya netewî” geş kir ji gelan, civa-

kan re ne aştî, demokrasî û azadî, lê xizanî, zextên siyasî yên giran yên di bin rejimên dîktayên paşverû û şerên dawî lênayê hilberand û hildiberîne.

Li Rojhilatanavîn siyaseta "berjewendiya netewî" çawa ku çareserî nayne; projeyên siyasî yên bi referansa olî û bi esasî pergala şerîetê jî, ji felsefe û ji hêza afirandina biratiya gelan û pirsgirêkên gel û civakan bêpar e. İslama ku bi şerê navxwe yê xwînî yên di nav mezheb û terîqetan û yê di nav şîa-sune ku hêna jî berdewam e ku reha wê di nav xwe de jî dûr dere, dabeşbûye û helbet ji İslama siyasî, persgirêkên erdnîgara me nikare çareser bike. Bi taybetî Îslama siyasî ku berhema projeya "Kembera Kesk" ya emperyalîzmê ye û pergalên bi referansa olî, ji navikê bi emperyalîzma Rojava ve girêdayî ne û ji ber vê, di dîroka nêz de ne çareserî, tim bêçareserî hilberandine.

Ji emperyalîzma Rojava hêvîkirin, modernîzma Rojava û siyaseta wê ya aborî ya pêşvebirvan wekî rizgarker dîtin, venebûneke din e. Siyaseta hevkarîya bi emperyalîzmê re dê nikaribe rizgarîya gelan bîne, ji dema mêtingehkarîya klasîk û heta roja me, di drokê de hatiye îspat kirin.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan, di bin roniya vê perspektîfê gişt̂ de; neteweperwerîya şoven, îlheqker, mêtinger, emperyalîst ango neteweperwerîya ku xwedî fikra emperyal in ji neteweperwerîya netewê bindest, yên têkoşîna hebûnê didin, wekî regez ji hev ciyawaz dike, naveroka demokratîk ya neteweperwerîya netewê bindest yên li dijî emperyalîzmê, mêtingehiyê pergalên îlheqker têdikoşin jî girîng bibîne.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan; ne neteweperweriyê lê gerdûnîtiyê, li şûna berjewendiya gişt̂ ya netewe, berjewendî û dahatûya gel, gelan bi kirpa E. Xanî, nêzîkahiya "hemû gelên li ser rûyê dinyayê, bi comerdî vexwend ser wê sifrê" bingeh digre, di zemînek hevdem de geş dike. Ji erdnîgara ku ling lê ye (ji Kurdistanê) bi bitûnî li herêmê-dinyayê dinêre; bratiya gelan û di kîşwera çand serdest ya dahatûyê de têkilandina gelan ya azad armanc dike.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan; perspektîfa "bi pîva mêjtina ku kes ji alî kesekî din ve, bi dawî bibe, paşî li mêjtina neteweyê ku ji alî neteweyekî din ve dê lê were. Bi pîva ku dijberîya nav çînên netewe ji holê rabe, dê dijminantiya neteweyekî ya raberî yê din jî de bi paşî bibe" (Manîfestoya Kominîst) diparêze. Wekî stratejî şerê vê dide.

KURDİSTAN

SİYASETA ENTEGRASYONÊ YA PERGALA TİRKİYÊ Û ENCAMÊN WÊ

Pergala Tirkiyê ku du taybetmendiyên damezrandinê yên wekî unîterî û neteweperwerî bingeh girtiye, di serî de bi şertê ku girêdayî "yekîtiya nedabeş ya Tirkiyê" bin, ji bo çînên ji netewe û kêmarên misilman tên, ji mêtingeha klasîk ciyawaztir, sînorkirin û astengî li ber mafê wan yê milk bi destxistinê neaniye. Ya duwemîn; di serî de armanca ji Kurdan û ji kêmaran afirandina neteweyekî (Tirk kirin) ye. Ya sêyemîn; bi taybetî ji layenê Kurdan ve; Kurd jî mîna Tirkan xwedî heman baweriyên olî bûne. Wekî encam, ji bo ku li Kurdistanê serdestiya xwe bajo, burjuvaziyê Tirkiyê û rejima wê ku tenê bi zor û zordestiyê qîma xwe neaniye, di bin diyarkerîya xwe de, bi burjuvazî û çînên serdest yên Kurdistanê re li hev hat.

Pergala Tirkiyê, wekî girêdayî armanca Tirkirinê; di siyaseta bihêz kirin ya geşkirina entegrasyonê de, bi pîlan birayê wê yê cêwî asîmîlasyon jî geş kiriye.

Ligel Kurdistan, li bajarên Tirkiyê (bi taybetî li bajrên lîmanan) jî, ku çîna burjuvaziyê Kurd / Kurdistanê derfeta razemenî-geşbûn û mezinbûnê dît, ji welîdîna xwe pê ve girêdayî burjuvaziyê Tirkiyê û wekî yekgirtiyê wê geş bûye. Ewqas ku di bin diyarkerîya burjuvaziyê Tirk / Tirkiyê de her burjuvaziyên ku ji netewe û kemarên ciyawaz hatî, xerca yekîtiya ku pêk hatiye ne "welat, netewe, al" e, berjewendiya çînî ye. Yekîtiya vê berjewendiyê îro jî didome. Burjuvaziyê Kurdistan, ji bo îcaba berjewendiyên xwe yên çînî, bi qanda aborî, ji alî siyasî ve jî bûye perçeyek pergala Tirkiyê. Çimkî, burjuvaziyê Kurd ku di sînorên pergala unîterî de, di îqtîdarê de gihîşt derfeta xwedî gotinê, dewleta KT û avahiya wê ya milîtarîst mîna hêza parastina xwe dibîne.

Li dijî pirsgirêka netewî ya Netewê Kurd çareser nebûye û hebûna Kurdan jî tê înkar kirin, burjuvaziyê Kurd wekî çîn, fonksiyona xwe ya netewî winda kiriye, derî îstîsnayan, ji tekoşîna azadiya netewî qetiyaye. Bi qanda ji alî çînî, ji alî netewî ve jî aliyê xwe diyar kiriye, li dijî têkoşîna hember pergalê û kapîtalîzmê geş dibe û dê geş bibe de, li gel birayê xwe yê çînî, burjuvaziyê Tirkiyê re tevdigere. Êdî li Kurdistanê dewleta KT yê ligel ku li Kurdistanê navgîna zordestiya netewî ya li ser gel e, navgîna burjuvazî û çînên serdest yên Kurd yên çewsandin û mêjtina girseyên karker-kedkar e jî.

Ligel çînên serdest yên Kurd, girseyên karker û kedkar jî, çi ji ber dîtina deriyekî nan, çi ji ber stratejiya şer, ji alî pergalê ve bi zora çekan koçberî bajarên Tirkiyê hatine kirin. Bi encama vê koçberiyê li Stenbol, İzmîr, Çukurova, Antalya di serî de li bajarên Tirkiyê kêmarek Kurd yê cidî hatiye pê. Ewqas ku rêjeyek bi qanda nîvê gelheya Kurdistanê, li bajarên Tirkiyê bi cîh bûne. Ev rewş;

Ligel ku mîna neyiniyên ruxîn û parçebûna avahiya demografîk, çandî, netewî a gelê Kurd dihewîne, eriniyek mîna ji alî şertên daringî ve pirek û perçînek navxwe ya şoreşek yekgirtî ya nav Tirkiyê û Kurdistan dihewîne. Karker, kedkarên Kurd, Tirk û yên ji gelên din ku sendîka di serî de, di avahiyên karbendî, aborî yên hevpar de cîh digrin, ji berîdayinek bi zanebûn bêtir, encama van şertên daringî yên diyarkirî ne.

Lİ KURDİSTANA BAKUR KAPÎTALÎZM JİYANÊ DİYAR DİKE

Li Kurdistana Bakur êdî ji mêj ve ye, yê jiyana aborî, civakî û çandî di-

yardike, terzê hilberînê yê kapîtalîst e. Bi taybetî, di 15 salên vê dawiyê de kapîtalîzm hem wekî emûdî û hem jî ufkî geşedanek cidî nîşan dide. Du hêmanên bingehîn yên ku vê geşadanê ditetikînin hene.

Yekemîn: "tevgera guhertina senayî" yê ku tê bi nav kirin û wekî parçeyek veguhestina senanyiyê ji navendê bo herêmê, Tirkiye jî senayiyê ji merkezên xwe diguhêze bajarên dorhêlê. Ya yekemîn ev geşedan e. Di encama vê geşedanê de li Konya, Aydin, Denîzlî, Trakya û li Kurdistanê jî Dîlok, Semsûr, Meraş û Meletî, erdnîgara ku van deran diguncîne, geşedanek senayiyê hat jîyîn, tê jîyîn. Her çar bajarên Kurdistanê yên nav borî bere bere pev ditêkilin û vediguherin hewzeyek senayiyê.

Duyemîn: Rejima unîter ya şoven ya Tirkiyê bi armanca geşkirina entegrasyon û asîmîlasyonê kapîtalîzma ku geş kiribû ya ji Dîlokê ta Erzuromê li bajarên ser sînor bi heman armancê, di van salên paşîn de li hundirê Kurdistanê jî pêk tîne. Projeya GAP ê senayîbûna sipartî zîreetê li sêkunca Riha, Amed û Mêrdînê jî geş dike.

Ligel senayiyê di sektora zîreet û xizmetê de jî êdî ya diyarker e, têkiliyên hilberîn-xeridîn yên xwerû yên kaptalîzmê ne. Bi armanca ku li Kurdistê jî civakek ku dirav û milkiyeta taybet dihebînin bête afirandin, gel ketiye bin gulebarana reklamên bazirganî û propaxanda, ligel ku berjewendiya burjuvazû ya çînî ji alî gel ve bête têkvexwarin, rasterast an nerasterast ragihandêra siyaseta asîmîlasyonê ya pergalê ye.

Wekî encamek jêneger ya geşbûna kapîtalîzmê, li Kurdistanê çînên hemdem afirî û diafirin. Netewê Kurd neteweyeke bindest e, lê belê netewe di nav xwe de, xwedî berjewendiyên çînî yên dijber bi burjûva bi çîna karker û tebeqeyên navber dihewîne. Gundîtî perçe bûye, ji alîyekî ve burjuvaziyê zîreetê û xakê, li hêla din bi berfirehî karkerên zîreetê, gundiyên xizan an jî karkerên demsalî, gundîtiya biçûk û navîn heye. Di vê pêvajoyê de bajarên Kurdistanê jî, bişid, bi girseya bêkaran-xizanan tijî bû, fûrîya.

Encamek geşedana kapîtalîzmê ya din jî, bi rêjeyek mezin, bere bere keda jin û zarokan jî li bajar û li qadên zîreetê vedikêşin nav hilberînê. Keda jin û zarokan ya bêsendîka, bêsîgorte, ji her mafê civakî bêpar, ji bo burjuvaziyê Kurd / Kurdistan, mûçedarên ku ji wan nirxa zêde pir bidest dixe ye. Bi taybetî keda jinê ya bimûçe ligel zîreetê di sektora senayî, bazirganî û xizmetê de dibe tevlêbûn ya girseya dixebite û di van salên dawî

de, di nav giştê keda bimûçe de keda jin û zarokan mezintir dibe. Li hember akama ol, kevneşopî û toreyan, jin ji bo kar û nan mecbûrî kuçe û derketina kuçeyan tê kirin. Ev geşedan, ji alîyekî ve barekî giran li jina dixebite ya bimûçe dike, ji alîyekî din ve bi teşeyî an sînorkirî be jî, ji bo jinê di jiyana civakî de derfeta mîna kesayetîbûnê, azadbûnê pêşkêş dike.

Di van salên dawî de bajar bişid mezin bûn, adetî bi mirovan tijî bû, fûrîya. Bajarîbûna ku mezinbûyî, ji aliyekî ve paralelî geşedanên civakî aborî ji çolteran berbi bajar ve bû sedema koçberiyê, ji aliyê din ve pergala Tikiyê çoltera Kurdistanê vala dike û berê wan dide bajaran. Encam; di demek kurt de bajarên Kurdistan û Tirkiyê bi milyonan gelheyên çolterê yên Kurd / Kurdistanî tijî bû, fûrîya. Ev pêvajo, ji mezinbûyîna bişid ya bajaran bêtir, bişid ji gundîbûna wan re rê vekir. Bajarîbûna şewş an jî gundîbûna bajaran, tevgera kominîst û demokratîk netewî, bi pirsgirêkên nû û giran ve rûbirû hişt. Kolan û kuçên bajaran bi betalan, bi xizanan, bi firoşkerên seyar û parsekan tijî bûn. Fuhûş û bazirganiya jinê, dejenerasyon bişid zêde bû. Ji aliyekî ve otomobîla luks, telefonên dest, kompîtur û heta bi helîkopterên taybet, ji alî din ji yekê bêtir jin, doza xwînê û jinên ku bi çarşevên reş diçin kar, evana dîmenên bajarîbûn û modernbûna şewş in. Ligel van pirsgirêkên giran û şewş bajar, li Kurdistanê navendên gelhe, tekoşîn û geşedanên siyasî, civakî, aborî û bi vê têkildar kêşeya şoreşa Kurdistanê ne. Tekoşîna ji bo azadiya netewî û sosyalîzmê dê bête geşkirin, di heman demê de pirsgirêkên giran û girift jî têkvedixwun.

Li Kurdistanê, di serî de ya di navbera bujûvazî û girseya karker-kedkar, nakokî û pevçûnên heyî, ji nakokiya navbera ked semayê xwedî dibe û li dora wê geş dibe, teşedigre. Wekî guncantirîn nakokî û pevçûn di navbera burjuvazî û çîna kaker, çînên xwedî milkên mezin û bêmilkan, mêtinkar û yên tên mêtin de geş dibe. Di civaka Kurd de ku heta niha hev hesibandinek kûr nejiyaye hevhesabdayina navbera çînan ya dahatû, dê li ser van nakokî û pevçûnan geş bibe.

Helbet karker, kedkar, bêkar û girseya xizan ya li bajêr çi bibîne bi (kîjan hilberîna daringî) di têkiliyê de be, wê fam dike û dê fam bike. Ancax pirsgirêka ku çi bête dayîn heye! Pergal û burjûvazî û wekî pir layen, li zemînên nû, di girseyan de kesayetiyek nû (di eslê xwe de bêkesayetî) ezîtiyek nû û bi aîdîyetek nû wan bi pergalê ve girêdide. Pirsgirêk,

welatparêz, pêşverû, kominîstên Kurdistanê, dê çi bidin girseyên kar-

ker-kedkar, zanebûnek çawa û rêxistinek çawa dê bête geş kirin. Pirsgirêk; geşkirina tekoşîna siyasî ya girêdayî armanca guherîna bingehîn ya radîkal ku dê kapîtalîzmê, pergala milkiyeta taybet bibore ye. Pirsgirêk, kaniya hemû nakokî û pirsgirêkên pergala milkiyeta taybet bi şoreşek civakî borandin e.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan, li Kurdistanê wekî stratejî, şoreşa civakî ku dê paşî li pergala mêtinkar ya kapîtalîst bîne, armanc dike, bi vê armanca bingehîn ve girêdayî, ji bo reforman têdikoşe. Ji bo daxwazên bilez yên aborî, civakî yên karker, bêkar, bêmilk û gundiyên kedkar têkoşîn û propaxandaya siyasî dê geş bike.

PİRSGİRÊKA KURD PİRSGİRÊKEK WELAT Û NETEWE YE

Statuya siyasî ya Kudistana Bakurî çi mêtingeh çi îlheq dibe, di bingeha xwe de Netewê Kurd, neteweyekî bindest e. Gelê Kurd ji hemû mafên xwe yên netewî bêpar hatiye hiştin, red û înkara li ser hebûna netewê Kurd ya KT berdwam dibe. Serekebûna nakokiya navbera pergala KT û Neteweyê Kurd ji vê siyaseta red û înkarê der dibe. Dewleta KT, dagirkirina li ser Kurdistanê, ji Osmaniyan dewr girt, kûrtir kir, di pêvajoyê de serdestiya xwe ya leşkerî, îdarî û siyasî geş kir. Dewleta KT, serdestiya xwe, ji serî de bi tevkuştinan, sirgûnan, bi koçber kirina darê zorê û bi asîmîlasyona ku bi vanan re tevlîhev e, didomîne.

Dagirkirina dewleta KT; ji alî aborî ve Kurdistan ji bo burjuvaziyê Tirkiyê re bazarek hundir ya berfireh pêşkêş dike, çavkaniyên dewlemendiyê, ji bo berjewendiya xwe, heta ku bigihê talan û wêran kirinê dimêje, ji alî siyasî ve, di bin çewsandina hêzek biyanî de, gel ji hemû mafên xwe yen netewî bêpar hatiye hiştin; ji alî civakî ve, li avahiya jor bermayên feodal û eşîrtî bi zanebûn zindî hatiye hiştin; ji alî çandî ve nezanî û ji par re mayin zindî hatiye hiştin, li ser ziman û çanda Kurd, zordestî û bi teşeyê kêmdîtina netewî ya giran, hebûna xwe didomîne. Pergala şoven ya KT, bi vanan hemûyan, rawestandina geşbûna gelê Kurd ya netewî-çandî, di pêvajoyê de bi temamî helandinê armanc dike. Azadiya netewî ku daxwaza sereke ya gelê Kurd e, di serî de bi zimanê dayikê mafê perwerdê, daxwazên netewî yên rojane ku daxwazên divê bilez bêne çareser kirin, ji vê derê tên.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan; pirsgirêka Kurd wekî pirsgirêka rizgarî-

ya welatekî, azadiya neteweyekî dibîne û çareserkirina wê, li erdnîgara Kurdistanê de bi çi teşeyî be, ji ve azade, di bingeha xwe de pirsgirêka mafê avakirina dewleta xwe ya netewî dibîne û binê vê xêz dike. Ji vê tespîtê ku pirsgirêka Kurd / Kurdistanê, di nava avahiya unîterî û sparteka "yek dewlet, yek netewe, yek ziman de" çareser nabe.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan; ji rewşa xwe ya siyasî, civakî, aborî ya parçeyê Bakurê Kurdistanê bi rê dikeve û di rewşa ku li Tirkiyê ji bo borîna avahiya dewleta unîter, milîtarîst, şoven mixalefetek dijber ya berfireh heye, di vê rewşê de şoreşa siyasî ya hevpar ya gelan armanc dike. Şoreşa siyasî ya ku dê pergalê biborîne, divê bi du Komarên sosyalîst yên federe bête bitac kirin. Mafê çarenûsê dê bi çi teşeyî wekî "serxwebûn", an "federasyon" ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê, bi temamî di rewşek azad de divê li erêniya gelê kurd serî bête dan, di vê layenê de armanc dike ku wekî sereta li Kurdistanê serî li referandûmê bête dan. Ancax, Tevgera Kominîst ya Kurdistanê, bi esasî ji geşkirina şoreşa netewî û civakî ya Kurdistana Bukur xwe berpirsiyar dibîne; ku rewşek giştî ya şoreşê li Tirkiyê tunebe, ji bo mixalefeta netewî û civakî ya Kurdistanê, îqtîdarbûnek bi Kurdistanê sînorkirî pêk were, di vê pêvajoyê de ji bo pêşengiya şoreşê dê têbikoşe. Di vê pêvajoya ku dê serbixwe geş bibe de, ji bo ku tevereyek kedê qezenc bike, dê hemû hêza xwe derxe holê.

Pirsgirêka Kurd, tenê bi bihûdê netewî, dibe ku, di têkiliyên mêtinger û hilberînê yên kapîtalîst de bêyî ku guherînên kûr pêk werin, çareser bibe. Gelek nimûneyên vê hene û nimûneya ku bi taybetiya me re yekser têkildar e, Kurdistana Başûr e. Hêzên dervayî kominîstan, hêzên demokratîk yên netewî ku tenê di lêgerînek çareserkirina demokratîk ya netewî de ne, piranî di vê layenê de ne.

Tevgera Kominst ya Kurdistan, di nav sînorên pergalê û sazûmana kapîtalîst de, çareserkirina pirsgirêka netewî ya demokratîk ya burjuva, wek girêdayî hedefa xwe ya stratejîk, diparêze. Vê parastina xwe, bi tezek siyasî ya "federasyona demokratîk û mafên kêmneteweyan" têkveduxwe, rojane dike. Ji bo ku hemû avahiyên kominîst û yên demokratîk yên netewî, rewşenbîr û gelê kedkar li pişt raweste û ji bo wê têbikoşe û ji bo ku bike hedefek pratîk-polîtîk, têdikoşe. Ji bo ku li Kurdistanê vîna siyasî ya yekgirtî bête afirandin û ev vîna ku teşeyek polîtîk û rêxistinî pêk bîne, ji kominîstan, demokratên welatperwer, lîberal, partiyên welatparêz yên İslamî,

hêz û heta kesan, di binê sîwanek siyasî (platform, eniya netewî, Kongreya Netewî hwd.) de biyek bike, ji bo avahiyek weha ya mayinde bête afirandin tekoşînê geş dike.

PİRSGİRÊKA KÊMARAN

Kêmarên Ereb, Ermen, Çerkez, Eşûrî hwd. yên li Kurdistanê, mîna gelê Kurd, ji alî pergala Tikiyê ve ketin bin çewsandinê. Ev gel ji hemû mafên xwe yên çandî, netewî bêpar hatine hiştin û bi asîmîlasyona darê zorê têne helandin. Li Kurdistana Bakurî, bi taybetî li bajarên ser sînor, kêmarek Tirk ya cidî jî heye. Li Kurdistanê, ti pirsgirêkek netewî ya kêmara Tirk nîne, lê ji alî çînî ve ligel Gelê Kurd, di binê heman çewsandin û mêtingeriyê de ye.

Li Enetolya navend ji mêj ve an ji ber xwe an ji koçberiyek girseyî ya bi darê zorê pêk hatiye û di encama wê de li hin navçe û herêman ku piraniya gelheyê pêk tînin, kêmarek Kurd afiriye. Kêmara li Enetoliya navî in e, ji mafê xwe yên netewî bêpar e û di bin asîmîlasyonek giran de ye.

Di serî de li metropolên Tirkiyê, hema hema li hemû bajarên xuya, kêm an pir gelheyek Kurd ya diyar heye. Li bajarên metropol yên mîna Stenbol, İzmîr, Çukurova, Antalya bi milyonan Kurd / Kurdistaniyan dihewînin. Kêmara Kurd ya li van deran ji alî çînî ve bi kedkarên Tirk û yên ji gelên din tên ve heman qederê parvedikin, lê belê ji alî netewî ve, di serî de ziman û çanda wan ya netewî, wekî netewî, bi tunebûnê re rûbirû ne.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan, diyar dike ku çarenûsa kêmarên Ereb, Ermen, Çerkez, Eşûrî û Tirk bi yê gelê Kurd re ketiye nav hev. Girseyên karker û kedkarên ji kemaran tên, ji bo pêkanîna şoreşa Kurdistanê, ligel karker, kedkarên Kurd, wan gazî yek rêxistinê û tekoşînê dike. Îlan dike ku dê li Kurdistanek azad, kêmar ji alî çandî û netewî ve, dê karibin xwe bi azadî îfade û bi rêxistin bikin, mafên wan dê di bin ewlehiyê de bin.

Mafên netewî-çandî ya kemara Kurd ya li Enetoliya navîn û metropolên Tirkiyê, diparêze û diyar dike ku dê rizgarîya wan ya paşî bi tekoşîna gelên karker-kedkar yên Tirkiyê ya ji bo demokrasî û sosyalîzmê de pêk were.

Ji bo geş kirina mafê netewî, çandî, civakî ya girseya Kurd ya li Ewrûpa têdikoşe.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan; wekî nêzîktêdyinek bingehîn ya din

têkildarî kêmarên li Kurdistan û Tirkiye; li erdnîgarek diyar (bajar, navçe, gund. hwd.) ku kêmar lê piraniya gelheyê pêk tînin, ji wê kêmarê re xweserîya erdnîgarîyê bingeh digre û li ser vê bingehê çareseriyê geş dike.

OL Û KÊMARÊN OLÎ

Ol jî mîna hemû teşeyên heş, vebiriqîna cîhana daringî ya ku di heşê mirov de ye. Di civakên bi çîn de ol, takekes gava di bin şertên jiyanê yên giran de bêçare dimîne û tenê dibe, wekî lîmanek ewle dibîne û têdigihê, an jî xwe lêgirtina asîmanan (Xweda) ku pê dane gihîştin e. Akama ol, ku li ser meyl û heşê girseyên ku ber bi bêçaretiyê û çewisandinê ve hatine daf dan û yên bi esasî bindest in, ji vir tê. İslam jî, ji rewşê ji xwe re wezîfe derxistiye û xwe wekî pira navbera her du dinyayan, ji kes / civakê re pêşkêş dike, ji ber vê ye.

Di heqîqetê de, "dinya din" hilberîna vebiriqîna vê dinyayê ango ya dinya daringî ye; paralelî şertên aborî, civakî. çandî yê dinya daringî (rasteqênî) ye, ol jî eşkere an sergirtî tûşî veguherînê dibin. Li pey hev îlana sê olên yek xwedayî û bi sedsalan e ku her sê ol jî bi îçtîhadan tekamula xwe didomînin, ev yek, li gora mercan xwe veguhertin e. Ola paşî ya semawî İslam jî xwe li gora vê guherînê veguhertiye. İslama ku gava nû derket bazirganî dipejirand, di roja me de jî piyaseya serbest û heta siyaseta abori ya neolîberal erê dike, li gora şertên guherî, milkiyeta takekesî erê dike, pîroz dike û diparêze. Ol, di rewşa me de İslam, di xuyabûnê de bi xebitîna sazkirina navbera dinya daringî manewî dertê pêşberî civakê, lê belê di eslê xwe de qada hemû xebatê ya ol an jî misyona wê ya sazker, bi temamî têkildarî sazkirina jîyana mirovê li dinya daringî ya aborî, civakî, siyasî û çandî ye. Ol têkildarî dinya "manewî" gotinan dibêje, lê belê têkildarî jiyana "daringî" kar dike. Wekî makezagona İslamê şerîet tam jî vanan dixebitîne.

Kominîst, kes an jî gelê ku bawerîya olî, têkiliya di navbera xwe û Xwedê de bisînor dike û bawerîya xwe ya olî wekî navgînek serdestî an jî mêtingerî li ser hinekî din bikarnayênin, ji ber bawerîya wî ya olî, hedef nagirin; dijberê vê, dixwaze wan qezenc bike û hemberî pergalê sazûmana mêtingeriyê wan bikşîne nava tekoşîna birêxistin. Ji bo jarbûna bandora ola siyasî ya li ser gel û ya girîng ji bo asteng kirina akama li ser tercîha gel, divê dorpêç kirin û tenê hiştina girseya karker kedkar ku ber bi bêka-

rîtiyê ve tê daf dan, bête borîn. Lê belê divê ji rewşa ku tenê daxwazker, pêşniyarker, bendekar û bêlebat bête derxistin û bibe dînamîk, kirdeyek siyasî ku karibe bibe afrînerê dîrok, hedef û daxwazên xwe. Li vira armanca me ew e ku em girseyên berfireh yên xwedî bawerîyên olî, hedef û daxwazên wan yên li dijî pergala şoven û sazûmana mêtinger wan bikin kirdeyek dînamîk.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan, di pirsgirêka azadiya ol û wîjdan de ji vê nêzîkahiyê tevdigere û wekî regezekê nêzîkahiya sekularîzmê bingeh digre. Bi tevgerîna vê nêzîkahiya bingehîn, diparêze ku dewlet xwe ji hemû ol, mezheb û bawerîyan cuda bike, dûrahiya wekhev li hember gişan raweste. Tevgerên kevneperst yên İslamî yên ku şerîetê, bi nêzîkahiya neteperwerîya Tirk û Tirktiyê jî bi nêzîkahiya şerîetê hevseng dikin û bi vî awayî jî di bin navê "biratiya umetê" de eşkere an girtî Tirkbûniyê diparêzin, wan wekî wersiyonek siyaseta şoven ya burjuva dibîne û li dijî wan radiweste. Lê belê avahî û tevgerên İslamî yên demokratîk, li dijî emperyalîzmê biratiya gelan, li dijî avahiya unîter ya KT, ji bo azadiya gelê Kurd û kêmneteweyan, li dijî sazûmana mêtinger ya kapîtalîst, ji bo pergalek "adil", wekhev gazî tekoşînê dike.

Îqtîdara İtîhad Terakî di salên paşî yên Osmanî de, bi armanc / bi pîlan siyaseta bisilman kirin û Tirkirinê meşand ev siyaset heta roja me ji alî dewleta KT ve jî bisîstem hatiye meşandin. Misilman kirina gelên nemisilman, Sunekirina Elewiyan, bi kûr kirin, di roja me de jî tê domandin

Tevgera Kominîst ya Kurdistan, ji bo rakirina zordestiya li ser gelên Elewî, Êzdî, Keldanî, Eşûrî bête rakirin û ji bo ku karibin xwe bi azadî îfade bikin merc bêtin afirandin, têdikoşe. Gazî hindikahiyên olî dike ku li dijî siyaseta Tirkirinê-misilmankirinê-sunekirinê berxwedanek demokratîk geş bikin. Ji bo li Kurdistanê biratiya rasteqîn ya navbera gel û civakên xwedî baweriyên ciyawaz yên olî û ji bo bi azadî pev re jiyinê ku ev jî ji geşbûn û bihêzbûna çanda enternasyonalîst sadir dibe, ji bo vê yekê gaziya, ku bi karker û kedkarên Kurd re, pev re têbikoşin û bi rêxistin bibin, li wan dike.

WEKÎ ZAYENDA BİNDEST RİZGARİYA JİNÊ

Di dîrokê de, pirsgirêka jinê an jî têkçûna pêşîn ya dîrokî ya zayenda mê ya mezin, bi derbasbûna civaka biçîn ku tê de mirov mirovî dimête û

xistiye bin destên xwe re, dest pê kiriye. Ligel derbasbûna ji civaka bêçîn bo ya biçîn de, yên ku tûşî çewsandina dualî heta li ciyê ku çewsandina netewî lê heye tûşî çewsandina sêalî dibe, di serî de jin e. Lê belê kolebûn, serf bûn û paşîn wekî koleyê azad karker bûn, ne tenê xwerûyî jinê ye, bi jin û mêran ve xwerûyî çîna bindest e. Ji civaka maderşahî (bêçîn) derbasbûn î civaka biçîn, heta roja me, civak guherîne, li belê di van civakên biçîn de, wekî zayenda bindest pirsgirêka jinê hem rewşa xwe ya xwerû parastiye û hem jî wekî jina kole, serf, karker di nava her civaka biçîn ku têkiliyên zordestî, newekhevî û mêtinger hilberandiye de, hebûna xwe ya rojane weke din jî domandiye. Ango ligel mêran heman heta girantir zordestiya mêtingerîya çînî jiyaye, di heman pêvajoyê de, di civaka mêrserdest de jin, wekî zayenda bindest, tûşî çewsandinek xwerû jî bûye.

Kapîtalîzmê, jin kêşaye nav pêvajoya hilberînê û ew kiriye regezek pergala piyaseya serbest. Paralelî diviyahiya hêza kar ya kapîtalîzmê jin, ji mêj ve ye vekêşaye nav jiyana xebatê, raberî vê, di serî de mafên siyasî, bigiştî dema mafê jinê hatiye stendin paşiya sedsala 19. û sedsala 20. ne. Bi taybetî, di serî de mafê hilbijartin-hilbijirînê di sedsala 20. de, mafên siyasî, civakî û dadî bidest xistiye, ango dema esasî ku jinê, ligel vatiniyên xwe qebûlkirina mafên wê ketiye bin ewlehiya zagonê, sedsala 20. ne. Pêşengek ji tevgera feminîst ya Fransizî Marîe Gouges (1755–1793) ji mêj ve bû digot ?ku mafê jinê ji bo daleqandinê heye, mafê wê ku derkeve kursiya meclîsê jî (heta bikeve lijneya dadweran jî) divê hebe" jî, lê jinê ancax di sedsala 20. de ev maf bi dest xist.

Em ji kîjan gûçê ve lê dinêrin binêrin, binketina jinê ya dîrokî, ango ku hat xistin rewşa zayendî, bi derbasbûna civaka biçînê re dest pêkiriye.

Di xeleka civaka paşîn di pergala kapîtalîzmê de, di dîroka ku li paş hatiye hiştin, raberî vê pevçûnên ku bi bedelên giran pêkhatiye jî ev binkeftin hêna jî nehatiye borîn.

Mezopotamya ku cara ewil şaristanî lê şîn bûye, di heman demê de, di dîrokê de cara pêşîn jin, lê ketiye rewşa zayenda bindest an jî pevçûnên ewil, li vê erdnîgarê hatiye avêtin. Erdnîgarek ku ajalvaniya ewil, zîreeta ewil ango jiyana xwecîh ya ewil û ji civaka bêçîn ya ewil, derbasbûna civaka ewil ya biçîn, ya dîtir her sê olên mezin yên semawî ku jê xwedîbûn, wekî ola yekxwuda Zeduştî jî, ewil li vir hat holê.

Ola Zerduştî taybetiyên ji civaka bêçîn derbasî civaka biçîn, ji bêdew-

letiyê derbasî dewletbûnê, ji olên pirxwedayî derbasî yekxwedayîbûnê hildigre. Ola Zerdeşt regezên civaka bêçîn, civakên azad yên bêdewlet û pirxwedatiyê dihewîne, hema, ruyê wê vegerîyaye civaka biçîn, dewletê û yekxwedayiyê û bi esasî van regezan têkveduxwe.

Di ol de kêmpayekirina jinê ku bi zerdeşt dest pêkir û li gora mêr ket rewşa talî, bi cihûtiyê û olên li pey yên semawî (İsewî, İslamî) dom kir. Taybetiya hevpar ya olên semawî, civaka biçîn ya mêrserdest diparêze;bêtirîn mêr dike xwediyê malbat û milkiyetê, xebitîna jinê jî bi xebata malê û welidandinê bi sînor dike. Terikandina jina bêzarok, ku emrê kitêba Mûsa ye, ji wê yekê tê. Ya paşî ne, Mûsa ku pêşengiya gelê Yahûdî ku ji Mirsê, ji ber zilma fîrewnan reviyan kir û hewla wî ya ji bo hin reforman, ne jî İsa ku li hin femînîzan û cîh bi cîh li hin regezên ji civaka komînal ji par re mayî meylên wî yên anarşîzan-kominîzan û ne jî kirpandina Mihemed ku "Bihuşt di bin lingên dayikan de ye" re, ne ola ku jin ji rewşa talî, duwemîn derkeve û çêbûnên mayinde pêk werin.

Qada ku piragirêka jinê ya tîpîk lê tê jîyîn jî bigiştî mezopotama û bi taybetî jî Kurdistan e. Li vê erdnîgarê hem mîtoya Hewa, tabûya zayendî û heta mîtoya ku jin bêhêz e, gelek adet, tore û pêşdarazên ku hilberînên dîroka rabirdû ne, ligel zordestî û mêtingerî ya xwerûyî kapîtalîzmê rû bi rû ye.

Yê ku dibêje "Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e" gelê Kurd e. Hema bi gotina "Çarika jina min li serê min be" yê ku jinê kêmpaye dike, adetî wekheviyê sifir dike jî heman gelê Kurd e. Jina Kurd / Kurdistanê, gotina pêşiyan ya "Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e" di tekoşîna azadî ya netewî ya sedsala dawî de rast derxistiye. Di serhildanên netewî de, di girtinên girseyî de, li ber deriyên girtîgehan, di şerê gerîla, bi tekoşîn û girevên aktîf yên li hemberî karsazan, ev yek îspat kiriye, îspat dike. Jina Kurd ne tenê şahidê serhildan û tekoşînê ye, lê dînamîka wê ya lebat e.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan; nêzîkahiya "dê mirovahî bi pêşengiya bîrdoza jinê rizgar bibe" çewt dibîne; materyalîzma dîrokî û Marksîzmê ne jin an jî mêr serdest; felsefeya rizgariyê û bîrdoza ji herdu zayendan yên bindest, yên tên mêtin, gelên di bin dest tên hêlan, çînan dibîne.

Li gora mêr, bi qanda naletkirina li jinê, pîrozandina wê jî çewt e. Perspektîfa guherîn ya şoreşger ya sedsala 21. de, jin û mêr ne wekî zayend, wekî mirov tê ragihîştin.

Bawer dike ku serkeftina sosyalîzmê nebe, rizgarîya jinê, jin nebe jî serkeftina sosyalîzmê ne gengaz e. Lê belê weke ku sosyalîzma hat jîyîn jî nîşan da ku, di bin îqtîdara sosyalîst de jî, pirsgirêka jinê, otomatîkman çareser nabe. Ji ber vê yekê jî, di sosyalîzmê de ku merheleya derbasbûna civaka kominîst ya jêr jî, pirsgirêka jinê herçend kêm bibe jî, dê hebûna xwe bidomîne.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan; ji bo wekheviya navbera zayendan; bi jin û mêr, bi ciwan û kal ku bibe kirdeya siyasî ya lebat ya rizgarîya çînînetewî ya gelê Kurd, jinê gazî şer dike. Di vê baweriyê de ye ku, di qadên civakî, siyasî, aborî de ji bo bi azadî û xwerû geşedan bête bidestxistin, divê bi dînamîkên hundirî re, jin tevgera xwe biafirîne.

ÇÎNA KARKER, SENDÎQE Û RÊXİSTİNÊN KEDÊ YÊN NÛ

Pirsgirêkên ku sendîqe rûbirû ne, di serî de bi avahiya xwe ya bîrokratîk ya qedemeya kargerîyê ye; lê belê pirsgirêk bi vê, ne sînorkirî ye.

Di demên navbera paşiya sedsala 19. û nîvê ewil yê sedsala 20. de, bi gişti sendîqe, ne mezringehên xwedî milk û pereyan bûn. Ewqas ku li mekanên mîna holikekê berxwedanên mezin û tevgerên grêvê karibûn birêxistin bikin. Di roja me de sendîqeya herî biçûk, herî zeîf jî, bi qanda ku cidî bête gotin, xwedî menqûl û dermenqûl in. dî gotina kargerê sendîqeyê, di heman demê de, kare bête gotin ku kargerê milkiyetek cidî ye jî. Xwedî milkiyetbûn, sedemên dejenerebûn û bîrokratîkbûn yên sereke ne.

Zemîna girseyî ya sendîqayan teng bû; lê belê milkiyeta ku kargerîya sendîqeyê kontrol dike û îdare dike, tersê wê mezin bûye, ku ev jî sedema bîrokratîkbûnê ya bingehîn e. Piştî ku pêla şoreşger ya sedsala 20. di qada dinyayê de paş vekşiya û di heman pêvajoyê de wekî diyarker avahî û tevgerên kominîst, şoreşger, pêşverû, bere bere veguherîn rewşa dînamîkên nav pergalê;mîna geşedanên jarbûna tevgera karkeran, avahiyên sendîqeyan yên heyî jî bêtirîn vediguherine perçeyek an jî dînamîkek hundirîn ya pergala kapîtalîzmê. Ev wekî pêvajoyekê di xebite. Çi kargerên sendîqeyan çi hin partiyên karker û kominîst sendîqeyan wekî " "rêxistinên civaka sivîl" dibînin û binav dikin ku ev jî hilberîna van geşedanan e.

Wekî girêdayî hedefa sermayê ya bihêzkirin û afirandina civaka sivîl; hedefa hepskirina sendîqeyan ku wan derveyî siyasetê, tenê bi tekoşîna mafên aborî-civakî ve sînorkirî ango hedefa di "qada sivîl" de hepskirin, di berjewendiya bîrokrasiya sendîqeyê de ye jî. Di vê pêvajoyê de, bîrokrasiya sendîqeyan jî di eslê xwe de lîstika demokrasiyê dilîzin. Wekî rêxistina sivîl ya herî mezin ya herî bi bandor ya li Tirkiyê TUSÎAD (Komeleya Senayîvan û Karsazan ya Tirkiyê) bi israr gava ku pir behsa "jihev cihêkirina qada siysasî û ya aborî" dike, heman karsazên TUSİD ê ji hukûmetê bêtir rojeva siyasetê dişopîne û li gor xwe destêwerdana pirsgirêkên siyasî yên herî girîng û krîtîk dike û helwestê nîşan dide. Qesda me ya ji lîstîka demokrasiyê ev e. Bîrokrasiya sendîqeyî ya jor, gava ku karker siyasetê dikin, "na tevlî siyasetê nebin, em rêxistinek civaka sivîl in" dibêjin, lê belê gava pirsgirêkên "niştiman", "memleket" hela pirsgirêka Kurd ku li rojevê rûdinê, bi helwestek neteweperwer aledarîya parastina dewleta unîter dikin.

Guherîna di rejima kedê de û paralelî geşedanên teknolojîk, palûkeyên mezin ku hilberîna girseyî pêk tînin û qismen biçûk bûne ku ew jî geşedanek din e, li ser rêxistina sendîqeyî tesîrê dike. Lêbelê ev yek, di bitûniya pirsgirêkên ku sendîqe rû bi rû ne, ne pirsgirêkek kilît e. Û îdîaya "nêzîkahî li paşiya sîstema palûka hilberînê ya girseyî tê" rastiyê tam nîşan nade; ji ber ku hilberîn qerektera xwe ya girseyîbûnê didomîne. Trenda geşedanê, berbi sîstema palûkê ya bi otomasyona bilind ve ye. Di vê berîdayinê de, dê palûke, qismen biçûk bibin, lêbelê di mercên kapîtalîzmê de hilberîn, dê karektera xwe ya girseyî biparêze.

Di pêvajoya hilbrînê de, ji dêvla keda jîndar, bere bere bêtirîn cihgirtina keda daringîbûn (makînebûn, otomasyon); raberî biçûkbûna sektorên senayî û zîreetê, paralelî mezinbûna sektora xizmetê, di yekgirtina keda bimûçe de veguherîna meslekî ango ji berstûşînan veguherîna berstûspîyan, wekî trend geş dibe. Lêbelê ev trend "ji keda sipartî hêza mil, veguherîna keda sipartî hêza serî divê neyê daxistin" ji xwe, di sektora xizmetê de hem hêza berstûşîn heye û hem jî weke din, bigiştî hêza kedê ya di sektora xizmetê de, wekî daringî proleter dibe. Wekî din, ji ber ku di civaka kapîtalîst de, sînorekî ku dê ototmasyon lê raweste heye, hêza kedê ya berstûşîn ya sipartî hêza mil, dê hebûna xwe bidomîne. Li welatên pêşveçûyî yê dinyayê, ku lê, di hêza kedê ya berstûşîn de kêmbûnek diyar tê jî-

yîn rast e; lêbelê li parzemînên Amerîkaya Latîn, Asya, Afrîka, tersê vê hêna jî hêjmara berstûşînan zêde dibe. Tenê li Çîn, Vîetnam û li Hindê, li dora 1, 5 milyar hêza kedê, ji mêtingerîya sermayeya navnetewî re hatiye vekirin. Bi berstûşîn û spîyan ve heza kedê ya bimûçe, bi hêjmar biçûkbûn li dera han, mezin dibe, ligel bi piroleterbûna girseya berstûşînan jî, ev dê mezintir bibe.

Di hêzwendakirina sendîqeyan de roleke girîng ya pêkanînên neolîberal yên sermayê û hukûmet dişopînin, heye. Sermaye ku, li pêşiya "azadiya aborîya sermayê" sendîqeyan asteng dibîne, ji bo ku wan bêtesîr bike gelek rê û rêbaz bikaranî, bikartîne. Xebata part-time, teşeronî, bikaranîna personelên bi qewl, di heman baskê xebatê de, heta di heman palûkê de, pêkanîna cudatiya mûçeyên ku didin karkeran; gavên layenî perçekirina yekîtiya tekoşînê ya meslekî, aborî ya çîna karker e û tesîrê jî dike.

Çîna karker, girseyên gel yên kedkar û bigiştî bêmilk, xizan dînamîkên bingehîn yên veguherîna şoreşger yên sesala 21. in. Çîna karker û sendîqe, li dijî van pêkanînên nû, di lêgerîna rêbaz û navgînên nû de, di qada dinyayê de ji nû ve bihêzbûna tekoşîna çîna karker, dê di borîna pirsgirêkên diyarkirî yên sendîqeyan de rolek girîng bilîze. Li dinya û Kurdistanê, li dijî tevgera kedê ya nû, ku ji binî ve tê / dê bête geşkirin, sendîqe an di hebûna xwe ya heyî de, dê guherînên bingehîn pêk bînin û bibin navgînên tekoşîna çînî an jî wekî diyarker dê bibin hêza yedek ya pergala sermayê û ev pêvajo dê kûr bibe.

Milîtaniyek kominîst û giyanekî kedkar di kargerîya sendîqeyan de nebe perspektîfek di berîdan û çalakiyên piratîk yên rizgarîya çîna karker, dê neyê serdest kirin; ji sendîqeyan, di geş kirina tekoşîna birêxistin ya çîna karker de ji nû ve rol hilgirtin nayê payîn.

Di şênberîya me de, berpirsiyarî û wezîfeyek kominîstan ku di nava sendîqeyan de xetek tekoşînê û meşek dûvedirêj himbêz bike û bisebr geş bike, berpirsiyarî û wezîfeyek wan heye. Ancax, êdî em nikarin tenê di meşa di nava sendîqeyan de, bes bibînin. Li derveyî sendîqeyan, lê ne alternatîfên sendîqeyan, divê rêxistinên kedê yên nû jî bêtin afirandin ku di vê babetê de berpirsiyarî û wezîfeyên me hene. Ji vê gûçê ve di demek kurt de, li derî sendqeyan û di nava girseya karker ya herî li binî û di nava girseya bêkaran de divê bête xebitîn û di vê xebatê de, gihîştina rêxistinên kedê yên nû divê armanca me be.

PİRSGİRÊKA WERZEYÊ
Û RÊXİSTİNKİRİNA KEDKARÊN WERZEYÊ

Werze di asteke kûrewî de; çi ji bo mirovan çi ji bo ajalan, ji ber wesfa wê ku pêdiviyên mecbûrî hildiberîne, ji nû ve tê rewşek stratejîk, dê were. Wekî din werze, tenê ne ji bo kesên di vê qadê de dixebitin û ji bo kesên ku jiyana xwe girêdayî werzeyê didomînin, her wiha ji bo kesên li bajaran dijîn jî, xwedî giringiyeke jêneger e. Zanist, teknolojî, teknolojiya ragihandinê, di jiyana mirov û civakê de girîng in; lê belê vana, nayên xwarin, nayên vexwarin. Mirov, civak, ototmobîl, telefona dest, navgînên şer nebin, karin bijîn, hema bêxwarin nikarin bijîn. Ji ber vê sedemê, di serî de giringiya genim û çavkaniyên ava şêrîn, di qada dinyayê de mezin dibe.

Tevgera Kominîst ya hemdem, pirsgirêka herî zor ya di sedûpêncî salên dîroka xwe de ku lê rû bi rû maye û ya ji hêla berjewendiya çîna karker ve qadeke herî bi pirsgirêk e, di serî de werze û bernameya werzeyê bûye. Bi taybetî li welatên ku bi şoreşa burjuvazî re lê reforma werze ya radîkal pêknehatiye, ev pirsgirêk bêtirîn bi êş tê jiyîn. Li xakê, bi taybetî li kargeriyên biçûk û navîn rakirina milkiyeta takekesî derdek, ranekirin jî mîna du derd, biye pirsgirêkek ji bo îqtîdarên sosyalîst.

Siyaseta sosyalîst ku li xakê milkiyeta taybetî bi temamî qedexe dike û hilberîna werzeyê, wekî milkiyeta gelemper û koman (kooperatîf hwd) ku pîlan dike, pêdiviyê, ligel bi bingehek teknîk ya bi hêz, bi têketinên teknolojîk, di hilbrîna werzeyê de boşahî û curetiyê, pêdiviyê bi kombûniyek çandî ya komînal heye ku kare layen û hisreta gelheya çolterê ya bi milkiyeta taybetî bihelîne.

Pêkanîna sosyalîst ku milkiyeta xaka mezin û hilberîna mezin ya werzeyê gelemper dike lê belê milkiyeta biçûk û navîn ya xak û hilberînê serbest berde, dê rê bide pirsgirêkên din. Pirsgirêka serî, meyla mezinbûna hilberîna biçûk e. Ev meyl, bi çanda çîna karker ya ku her cure milkiyeta taybet didervîne dê di nav nakokiyê de be.

Li Kurdistanê şoreşa burjuvazî ya demokratîk pêknehatiye û wekî hilberîna vê yekê reforma xak û werzeyê pênehatiye. Geşedana kapîtalîzmê ya di werzeyê de wekî pêvajoye bi êş bi terza tekamulê geşbûye, bi hêzbûye, paralelî vê axayên feodal yên xakê, di werzeyê de bi têketinên

teknolojîk berî dan hilberîna bi makîne û ligel ve jî bi bankeyên bazirganî re jî di nav têkiliyan de, bûn tevlêbûneke aborîya bazarê ku ew pêvajo di heman demê de bû pêvajoya ku axayên feodal bûn burjuvaziyên xak û werzeyê. Di qada çolter-werzeyê de ligel ku li avahiya jor hin nirxên darazê yên mîna adet, tore, kevneşopî didomin jî, raberî vê hilberîna werzeyê, bazarkirin û di xeridandinê de ya serdest ji mêj ve ye, têkiliyên kapîtalîst in. Eşîrên ku li zozanan li pey colan in, êdî bi rîya înternetê di lêgerîna reklam û bazaran de ne, ya serdest ya aborîya vê çolterê, hilberîna ji bo bazarê ye. Projeya Başûrê Rojhilatê Enetolê (GAP) ku hewzeyên werzeyê yên Kurdistanê diguncîne, vê pêvajoyê hem wekî ufkî hem jî emûdî kûr dike.

Di serî de GAP avdana sûnî, bend û golet, di dema kurt de hilberdariyê zêde dike, ancax di dema navîn û dirêj de, di xak û hilberîna werzeyê de, rê dide / dê rê bide encamên ku telafiya wan ne gengaz bin. Hevsenga ekolojîk xera dibe, ligel ku xak zû bi xwê dibe û dibe çol, xetereya veguherîna araziyên bêadan ji niha ve li deştên Heran û Ceylanpinarê dibe pirsgirêkek rojane. Senayîbûna werzeyê, adanê gelekî zêde dike, ancax serzêdeyên daringî û antîbiyotîk xwezaya hilber û xwurekan xera dike. Wekî din, ji bo li qadên werzeyê bêtirîn hilber bête bidestxistin, bikaranîna ziblê çêker û dermanên kêzikan sewze, giya, ajal û bi navgîna wan, xetera jehrîbûna mirovan mezin dike.

Têkilî GAP ê miçilgeyên "dê refaha herêm û gelê herêmê zêde bike, talihê wê yê xerab biguherîne" rastiyê nîşan nadin. Bi pêvajoya GAP ê dewlemendî û xizanî bi xetên xuya di du hêlên dijber de sift dibe. Senayiya sipartî werzeyê ya li herêmê, li Tirkiyê û Kurdistanê ji bo burjuvaziyê senayî û werzeyê, grûbên navnetewî yên bi wan re têkilîne, dewlemendiyê li ser dewlemendiyê dike, para karker, gelê kedkar, gundiyên xizan û biçûk, xizanî, herî zêde bêsendîqe, bêsîgorte û bi kedek erzan dîtina karekî ye.

Şerê di 20 salên vê paşiyê de tê ajotin, werzeya Kurdistana Bakur û bigiştî li qada çolterê ji kûr ve akam dike, heta tûşî ruxînê dike. Bombebarana çiya û çolterên Kurdistanê, bi navê "ziwakirina çavkaniyên qadên jiyanê yê gerîla" jehrîkirina çavkaniyên avên zozanan, şewitandina daristanan û paşê jî bi darê zorê valakirina gelheya çolterê, di qada ajalvanî û werzeyê de, demek dirêj encamên ku telafiya wan ne gengaze aniye holê.

Tekelên werzeyê yên welatên emperyalîst yên mîna YDA, Holende, Îsraîl, civakên Asya, Amerîkaya Latîn û Afrîka ji mêtingeriyê wêdetir bi armanca ku wan bi birçîbûnê terbiye bike, ji sewze heta genim, bi tovên hibrît (stewr) bi xwe ve girê dide. Yekîtiya Awrûpa û IMF ku "pakêtên ahenga avahî" ku ferz dikin, di hilberînê de sînorkirina "kota" yê û rik û hişyariyên "krêdiyên werzeyê bibirin" bigiştî li ser werzeya Tirkiyê ligel wê, li werzeya Kurdistanê jî akamek neyînî dike. Rojava ya emperyalîst, li civakên Asya, Afrîka, Amerîka Latîn, siyaseta "subvansiyona werzeyê rakin" ferz dike, ligel vê, ji bo werzeya xwe jî subvansiyonê tim zêde dike. Hilberînên werzeyê yên ji daxwaza hundir zêdetir bi dest dixe, bi subvansiyonên bilind dajo bazarên derve û bi vê yekê reqabeta neheq geş dike. Ewqas ku di serê salên 1990 î de li welatên OECD subvansiyona werzeyê ya salane 230 milyar dolar bû, bi hatina salên 2007 an ev reqem ji 300 milyar dolarî derbas bû. Mîna her qadên aboriyê, ji bo werzeyê jî gotina "lîberalbûnî" çîrok e. Tekelên werzeyê yên emperyalîst eşkere dibêjin "bi ya min bike lê, bi yên ez dikim, neke?

Bi taybetî di serê sedsala 21. de kominîst, layenên şaristaniya senayî ya kapîtalîst ku werzeyê li der dihêle, divê red bikin û binî xêz bikin ku werze û ajalvanî, zineetê herî kevn yê dîroka mirovahiyê ne. Di werze û xwurêkê de, ji alî serdestiya xwurekê ve, divê her welat, erdnîgar û civakên biçûk yên herêmî serbixwe bin. Ev têrî xwebûn, ligel erdnîgar û herêmên din, divê hevborîn be û divê sipartî regeza hevtemamkirina hevraber be. Wekî din gihîştina xwurekan, mafekî mirovî ye, pêwistiya hebûna jîyînê ya biyolojîk e, bi yên xwedî derfet, nayê sînorkirin.

Ligel hemû van pirsgirêkên ku tên jîyîn, wekî kominîstên Kurdistanê, ma emê bilindkirina fiyetê zemînî yên hilberên bi kêra burjuvaziyê werze û xakê tê, yê ku ji bo bazarê hilberîna bi pîvek mezin dikin, biparêzin? Na! daxwaza demkurt û hedef, ji bo rakirina bazirgan-qebal yên navbera hilbêr û xerîdar; rakirina çewsandinên tekelên werze û xakê ku ji alî dewletê ve tên destek kirin ya li ser hilberîna biçûk û navîn; rakirina kontrol û bandora tekelên werzeyê yên emperyalîst yên dinyayê; îptalkirina deyndarîya banqe û bazirgan-qebal; û milkiyeta mezin ya xakê ku dê bi reforma xak û werzeyê bête rakirin, em hedef digrin.

Di demdirêjiyê de wekî hedefa stratejîk, em çareserîya şoreşger ya ku dê di xakê de, paşî li milkiyeta takekesî bîne ku çavkaniya hemû nakokî,

berberî, hemû xerabiyan e, bingeh bigrin. Di dema kurt de, divê bicîh anîna daxwazên kedkarên werzeyê yên bimûçe û daxwazên hilbervanên xizan û biçûk bête armanc kirin. Ligel vê, ligel daxwaza gelheya çoltera ku bi zorê hatine bidûrxistin vegerin cîhên xwe, di qada werzeyê de tekoşîn û birêxistin bête geş kirin. Vana di nava vatinî û berpirsiyariyên Tevgera Kominîst ya Kurdistanê de ne.

YEKÎTİYA AWRÛPA, TİRKİYE Û PİRSGİRÊKA KURDİSTAN

Awrûpa, bi taybetî Awrûpaya rojava heta çaryeka paşî ya sedsala 20. hem li hundir hem jî li derve (di asta navnetewî de) di bin pesta tevgara kominîst de jiya. Şevreşka Kominîzmê li Awrûpa digerîya. Di eslê xwe de dînamîkên pêvajo û pêvajo bi xwe ji vê hedefê dûr bin jî, bi kêmanî, di xuyaniyê de tablo ev bû. Piştî şerê cîhanê yê duwemîn, wekî blok welatên sosyalîst di sehna siyasetê de cîh girtin û li pey vê pêk hatina şoreşên Çîn, Kûba, Vîetnam, rejimên Awrûpa ji çepê ve dipestand.

Di vê kişwera siyasî de, pêngavên Awrûpaya Rojava wekî "Yekîtiya Komirê û Pola" gavên ewil yên Yekîtiya Awûpa ya niha avêtin, ancax nediketin layena borandina sînorên netewî, sembol û nirxan. Ji ber ku tevgera ked û kominîst ya navnetewî ku bi perspektîfek enternasyonalî û bi hêz tevdigerîyan, her gavek di vê derbarê de bête avêtin, dikaribû ji alî hêzê ve di qada Awrûpa de ji bo şoreşê bête nirxandin ku Awrûpa Rojava di bin vê çewsandinê de bû. Her geşedanek ji bo mehandina netewetiyê, dikaribû karê kominîstan hêsantir bike!

Ligel ku Sîstema Sosyalîst di serê salên 1990 î de ruxiya, pê re jî tevgera kominîst tûşî wendabûna hêz û miçilgeyê bû. Ligel vê, bigiştî ji par re ket, paralelî vê jî sermayeya Awrûpa û pergalên wê, ji bo demek kurt be jî, ji çewisandina "xeter?a kominîzmê filitîn. Sermayê bi hedefa borandina netewîtiyê gavên "kûrewîbûn", "cîhanîbûn?ê şidand. Di van 15 salên dawî de pêvajoya Yekîtiya Awrûpa, ji bo vê yekê bi gavên şid geşbû.

Li Awrûpayê, sermaye û pergalên wê bi hestên jixwe bawer û helbet ligel hin faktorên din, berî da borandina sînorên netewî, sembol û nirxan; ligel vê, tevgera kominîst jî wekî diyarker, dijberî vê, erozyona baweriyê jiya, ber bi hundir ve çilmisî, biçûk bû; di bin bandora van faktoran de xwe li piştbehaneya "YA yekîtiya sermayê ye" (û ev rast e) veşart û ket pozîsyona parastina sînorên heyî û dewleta netewî. Ne ji bo hemûyan be

jî, ji bo piraniya partiyên kominîst ev yek rewacdar e.

Ji bo siyaseta burjuva û ya kominîst, şoreşger ku tespîtên me li jor jê bahs kir, demdemî ye. Tekoşîna karker, bindest û yên tên mêjtin her ku li ser zemînên nû, ji nû ve teşe digre (daneyên wê yên ewil rûdidin) ligel vê teşegirtinê siyaseta kominîst, şoreşger pêk ve di nav hevakamekê de, her ku ji nû ve bihêz bibe û bi perspektîfek enternasyonalî, di qada Awrûpa û dinyayê de ji bo guherîna radîqal bibe aqtorên siyasî yên bihêz; dê an sermaya Awrûpa mecbûrî vekişîna sînorên netewîtî - parastvaniyê bike an jî dê fersendê nede vê yekê û bi şoreşa Awrûpa an bi rêze şoreşên peyhev dê bixe kûrahiya dîrokê.

Wekî tevgera Kominîst ya Kurdistan, li pêvajoya YA em pêşî wiha dinêrin. Têkiliyên YA û Tirkiyê, an jî pêvajoya Tirkiyê ya YA ji gelek hêlan ve gelê Kurdistan û siyaseta wê têkildar dike.

Ya yekemîn Kurdistana bûye çar parçeyan û parçeyê Kurdistan yê herî mazin diguncîne ji ber ku bi giştî bi îro ya gelê Kurdistan û dahatûya wê rasterast re têkildar e, pirsgirêka me kominîstan e jî.

Ya duwemîn; paralelî kûrbûna pêvajoya YA, ji ber ku dahatûya abarî, civakî, siyasî û çandî ya karker-kedkarên ji netewe û kêmarên Tirk, Kurd, Laz, Ereb, Ermen dê ji kûr ve akam bike, pirsgirêka me ye.

Ya sêyemîn; bi taybetî hilberînerên biçûk û navîn û ji layenê guncanî ve, ji ber ku dê akamek ruxîner li qada werzeyê bike, pirsgirêka me ye.

Ya çaremîn; Pêvajoya endametiya Tirkiyê ya YA, bi qanda ya sermayê, ya sendîqeyan, bi qanda ya neteweperwerîya Kurd ya çepê lîberal û heta bi êdî projeya rizgarî ya Îslama siyasî ye û bûye hêviya wan jî, ji ber vê pirsgirêka me ye.

Akama di van qadên diyarkirî de cot layen e; li gel hin akamên wê yên erênî, ji ber ku dê yekîtî di pêşengiya semayeya emperyalîst de geş dibe neyînî û ruxîner e û her du layen dê di heman pêvajoyê de bête jîyîn. Helwesta Tevgera Kominîst ya Kurdistan ya têkildarî pêvajoya YA, perspektîfek bitûnî ya layenên erênî-neyînî digre berçav, têkveduxwe.

Bi giştî pêvajoya YA, bi taybetî pêvajoya YA- Tirkiyê bi asta ku niha gihîştiyê de, divê di qada pratîk-polîtîk de em helwesta rasterast deynin. Têkildarî pêvajoyê, wekî xetên bingehîn yê siyaseta ku dê kominîst bişopînin;

1- Dê bi zanebûn ku YA projeyek emperyalîst kapîtalîst e tevbigere.

2- Pêvajoya YA, digel me, di pêşengiya semayê de kûr bibe û nirx û sembolên netewî pere, al, sînor di leha YA de (wêdetirî netewî) jar bibe û ev yek dê wekî pêvajoyê geş bibe; di vê pêvajoyê de, ji aliyekî ve li dijî armancên emperyalîst yên YA dê helwestê bigre, ji alî din ve jî di bunyeya YA de li dijî sermayê dê ligel tevgera ked û kominîst berî bida tekoşîna hevpar.

3- Bi heman nêzîkahiyê, di serî de di navbera Fransa-Almanya de, wekî pêvajoyek ku dê şerên xwînî yên navbera netewe dewletan yên li ser tevereya berjewendiya netewî dê ji par re bihêle, dê şertên daringî yên di asta parzemîna Awrûpa de bihêz bike ku sermaye û kedê, bindest û serdestê ku dê bi tazîtî raberî hev bike, dibîne.

Awrûpa ya ked û gelan, di qada dinyayê de, di şerê rakirina sînor û sembolên netewî de wekî gavek girîng dibîne û ji bo vê yekê têdikoşe.

4-Ligel ku helwest û rexneyên tevgera şoreşger ya Tirkiyê yên têkildarî wesfandina emperyalîst-kapîtalîst, bimaf û di cîh de dibîne, li dijî YA parastina wesfa unîterî ya Komara Tirkiyê ku berîdan û helwestek çewt î ragirvan û parastvan dibîne û rexne dike.

5- Pêvajoya Tirkiyê ya YA, ku geş bibe û bi erênî encam bide jî, ev yek, bigiştî ji bo gelê me yê karker-kedkar û bi taybetî rizgarîya netewî, civakî ya gelê Kurd, de pêk neyîne, binê vê yekê xêz dike û di vê tevereyê de propaxandayê geş dike.

6-Wekî aborî, siyasî û çandî navendîtiya Awrûpa red dike. Di hin dînamkên siyaseta welatparêz, şoreşger yên gel / gelên me yê karker-kedkar de û bi taybetî jî, di hin rewşenbîrên me de, ji heyraniya navendîtiya Awrûpa wêdetir ku parêzvaniya wê têkveduxwe rexne dike, di vê layenê de hişyarkirina timdom wekî vatinî zane. Li şûna navendîtiya Rojava an jî Rojhilat, ji bo ji her lî ve sentezbûnek nû, hevdîtinek nû ya Rojhilat û Rojava pêk were, herkesî gazî tekoşîn dayinê dike.

KAPÎTALÎZM, ŞOVENÎZM Û CİWANÎ

Vezena pêvajoya hilberînê, di civakê de geşkirina çanda qalibên xeridandinê, kampanyayên ji îdeolojî û siyasetê re “na”, pîrozandina takekesîtiyê û paşî durûtiya “fersenda wekheviyê?; di civakê de, herî zêde li ciwaniyê akamê dike. Ciwaniya Kurdistanê, ligel vana, bi encamên giran yên ku siyaseta pergala nîjadperest, şoven ku li dijî gelê Kurd dişopîne re rû bi

rû ye.

Di civakên kapîtalîst de, siyaseta Keynesvan ya dewleta civakî li paş hatiye hiştin û siyaseta neolîberal yên mîna vezandina rejima kedê, di piyaseya kedê de jî, berebere taybetiyek bêpergal, neewle, part-tîme dide qezenc kirin. Tu îro dixebitî, sibê tu karî bêkar bimînî. Ji bo karê bawerane, perwerdebûyî, bitecrûbeyî, biwesifbûn jî têr nake.

Ciwanî, ciwaniya şagirt ligel xwendinê, di piyaseya kar de cîh digre û pê re artêşta bidîplome mezin dibe. Paralelî vê, li şûna ciwaniya bihêvî li dahatûya xwe dinêre, bixwe ewle cihê xwe ji ciwaniya ku cihê wê di piyasa kedê de tim nediyar e, bêhêvî, bêewle re dihêle.

Di sefên ciwaniyê de, bi markayên bikartîne hatin nas kirin û grûb bûn ango bi navgîniya daringên ku tên xeridîn nasname bidest xistin, çi bigre ketiye pêşiya nasnameya netewe, malbat, çîn hwd. Qalibên hilberînê yên vezen, herkan, guherbar û hengavî bi pergala kedê î postfordîst re dibe dînamîka piyasa serbest. Civak, bi taybetî jî ciwanî, çiqas zû kevn bike û çiqas zû biguherîne, dê hewqasî bizavê (dînamîzm) bide piyasê. Semaye û pergalên wê, ne tenê hêmanên daringî yên mîna lixwekirinê, xwarin, nirxên manewî yên mîna hezkirin, evînê jî ku wekî "bikarbîne bavêje" tê îfade kirin, kiriye tiştekî çanda xeridandinê ya kapîtalîst. Civak, ji alî xeleka zarokan ku nuxteyek şikestok ya civakê ye, digemirîne. Zarok, êdî ligel mêtingerîya kedê, wekî hêmanek reklamê jî tê bikaraîn.

Sermaye û pergalên wê, ji bo ciwaniyê hişyarî û berîdanên mîna "ji îdeolojî û siyaset re bêjin na û biheş (rasyonel) tevbigerin, dev ji rizgarkirina cîhanê berdin, li xwe xelaskirinê binêrin, wekî takekesekî şîrket û dewletê yê sernerm pere qezenc bikin, zayendiya xwe bijîn" dike. Ligel ku hişyarîya, ji îdeolojî û siyasetê dûr rawestin li ciwaniyê dikin, ew bixwe di berjewendiya xwe ya çînî de nêzîkahiyek îdeolojîk û siyasî li ciwaniyê dikin. Rêxistinên siyasî yên sivîl yên mîna mezringehên TUSİAD, kargerîya zanko, artêş, heta mizgeft, dêr jî ciwanan, ji ciwanên şagirt re "ji îdeolojî û siyasetê dûr rawestin" dibêjin, lê belê ew bixwe, li hemberî her pirsgirêkek cidî ya li ser welat û sermayê, bi helwesta îdeolojîk siyasetê dikin.

Semaye û pergalên wê di propaxandaya vegerî ciwaniyê de "her welatî, di mafê milk bidestxistinê de, di siyasetê de, li pêşberî dadgehê û di perwerdê de, wekhev e" dibêjin. Ev miçilge ji hêla teşeyî ve rast e. Ji bo xwedî milkbûniyê an jî wekîlbûniyê an jî xwendinê, li kutûga nîjada mi-

rov nayê nêrîn. Her welatî pêşberî zagonê wekî teşeyî wekhev e, xwedî mafê wekhev e. Lê belê di jîyana rastîn de xwedî milk û bêmilkî, bindest û serdest, xizan û dewlemend ne xwedî fersenda wekhev in. Zarokên karsaz perwerdeya taybet digre û zarokê karker, yê azmûna zankoyê qezenc nekiribe lê karibe li zankoya taybet xwe qeyd bike û yê ji ber deriyê zankoyê vedigere û tevlî artêşa bêkaran dibe, ne xwedî heman fersenda wekhev in. Wekheviya bi zagonan hatiye bidest xistin, di jîyana rastîn de hundirê wê hatiye vala kirin û hatiye teşeyî kirin.

Bujuvazî ku çekek propaxandayê vegerî ciwaniyê bêtir bikartîne, di pirsgirêka azadiya takekesî de jî ciwanî bi heman rewşê ve rûbirû dimîne. Ku civaka feodal ya siyasî serdest bi civaka kapîtalîst ya aborî serdest were qiyas kirin, kapîtalîzm bi azadiyên takekesî tê ravekirin. Azadiya bidestketî, ji bo karker xebitîn û nexebitîn an jî mafê guherina patron dide, lê belê ev maf, gava karker kar neke bi tehdîda ji birçîna mirinê ve sînorkirî ye, piştî vezandina piyaseya kedê, ji bo karker êdî derfeta guherandina patron jî berbere ji dest tê derxistin. Heger azadiya takekesî, serberdayî, bêkar û birçî gerîn be, ciwanî bêtirîn ji vê para xwe digre.

Ciwaniya Kurdistan, di çewsandin û dorpêçkirinek ku wî tûşî ruxîna daringî û bi taybetî ya manewî dike de, tê dinyê-mezin dibe. Ruxandina heş ya ku ji perwerdeya bi zimanê biyanî pêk tê, herî zêde ciwanî, ciwaniya şagirt dijî. Hedefa teror û çewsandinê ya pergala şoven, dîsa ciwanî ye. Girseya betalên bajarên Kurdistanê, bi piraniyek mezin ji ciwanan pêk tên. Dorpêçkirin û terora siyasî û aborî, bi adet û tore yên herêmî ve dibin yek, beşekê ber bi xwekuştinê ve kaş dike; ciwanî (bi taybetî keçên ciwan) bi rêjeyek mezin ya vê beşê pêktîne. Reklamên mîna "ez azad im" û bi promasyonan, helwestên mîna zayendiya ciwaniyê, azwerîya diravî tê qamçî kirin. Ev bombebarana reklaman, ligel xizmeta berjewendiya sermayê dike, yekser an neyekser hilgirê siyaseta pişaftinê ya pergala şoven e.

Li cîhanê û li welatê me, ciwanî ya ku bi qanda daringî, ji alî manewî ve jî hatiye dorpêç kirin, vê dorpêçkirinê bi tenê û bi rabûna daxwazên xwe yên xwerû, nikare biqelêşe. Ligel ciwaniya karker ku di pêvajoya hilberînê de ye, bi rêjeyek zêde dibe ciwaniya şagirt ku tê vekişîn pêvajoya hilberînê û pirsgirêka gelê karker-kedkar, li gora duh bêtir dikeve navahev. Wekî lêzêde ji alî ciwaniya Kurdistanê ve pirsgirêka sereke ya azadiya ne-

tewî, jixwe bingehek hevpar ya gel û ciwaniyê ye. Raberî linavhev ketina pirsgirêkên aborî, civakî, siyasî jî qada tekoşîna ji bo pirsgirêkên xwerû yên ciwaniyê, bitaybetî yên ciwaniya şagirt, hebûna xwe diparêze.

Ev rewş; hem geşkirina tekoşîna xwerû ya li zankoyê hem jî rewşa borandina sînorên zankoyê-xwendegehê ya ciwaniya şagirt, rojane dike. Li gora duh bêtirîn daneyan pêşkêş dike. Tevgera Kominîst ya Kurdistan; bi pêwistiya dînamîzm û utopyayê divê ciwanî, ciwaniya şagirt ji nû ve ji bo "hewldana karên mezin yên ji serê xwe mezintir" ango rizgarîya gel, bi zanîn û hedefa îdeolojîk ku bi helwest û çalakiyên wî ve hatiye mêtin, siyasetê bike. Divê li dijî pergalê ku dibistan, kantîna li zankoyê, pirtûkxane û pansiyonê ku ji mekaniya civakbûniyê, siyasîbûniyê hatiye derxistin, têbikoşe. Ligel redkirina takekesiya biye mişraqa ezîtiyê ji bo afirandina kesê piralî û bihêz ciwaniyê gazî şer dike. Û di wê baweriyê de ye, vana, ancax ciwan ku nebin bendeyên çewtiyên xwe, li ser pratîka xwe xwenûkirî, lêpirsî, dê karibin biserkevin.